

K.T.
Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê
Enstîtûya Zimanên Zindî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**RAVEBER WEKÊ KERESTEYÊKÎ SERBAR DI HEVOKÊ DA
(HOZANÊN GORAN WEKÊ MÎNAK)**

Amadekar
Ashti Samad Rahman

Şêwirmend
Doç. Dr.Ömer ÇİFTÇİ

Wan-2019

T.C.
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**CÜMLEDE YARDIMCI ÖGE OLARAK TAMAMLANAN UNSURU
(ÖRNEKLEM: GORAN'IN ŞİİRLERİNDE CÜMLE ÖRGÜSÜ)**

Hazırlayan
Ashti Samad Rahman

Danışman
Doç. Dr.Ömer ÇİFTÇİ

Van-2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ danışmanlığında, Ashti Samad RAHMAN tarafından hazırlanan
“Raveber Wekê Keristeyekî Serbar Di Hevokê Da Hozanên Goran Wekê Mînak” adlı
bu çalışma, 12/04/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim
Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü

KURTE

TEZA LÎSANSÂ BILIND

RAVEBER WEKÊ KERESTEYÊKÎ SERBAR DI HEVOKÊ DA

(HOZANÊN GORAN WEKÊ MÎNAK)

Di vê serdemê de karê herî girîng yê zimanan, pêşveçûna ligel zanist û teknolojiyê ye. Îro zanist û teknoloji roj bi roj bipêşve diçin, lewre divê ziman her dem peyvên nû çê bike ji bo civakê, bi taybetî jî ji bo ev zanist û teknolojiyên ku taze çêbûne û hatine nav wê civakê. Eger zimanê her milletî nikaribe peyvên nû çêbike mecbûr e peyvan ji zimanê biyanî bistîne bo dewlemendkirina zimanê xwe. Bi vî awayî ew ziman dikeve bin karîgeriya zimanên biyanî heta wisa lê tê ku peyvên xwe yên resen jî ji bîr dike. Ji ber vê yekê bi dirêjahiya demê re eger ev ziman hişyar nebe û xwediyan wî zimanî bi awayekî akademîk girîngiyê bi zimanê xwe nedin, ew ziman dimre. Dema ku ziman mir, rêzimana vî zimanî jî dimre, ji ber vê yekê xwediyan vî zimanê mirî mecbûr in zimanekî din bikarbînin ango mecbûr in ku zimanê milletekî din bikarbînin. Eger her milletê ku bixwaze zimanê xwe yê resen biparêze û bi paqijî bihêle divê xwediyan wî zimanî her dem çalakîyan li ser zimanî darbixin bo pêşveçûn û paqijîya zimanê xwe ji peyvên zimanê milletên din. Em di vê tezê de li ser rêziman dixebitin, ango li ser babetek ji babetekî rêzimanê dixebitin, ev babet jî “Raveber” e. Raveber, babeteke ji babetên rêziman e, babeteke gelekî girîng e. Di vê tezê de bi awayekî akademîk xebat li ser babeta ravebera hatiye kirin û mînak ji wan hatiye girtin û ew mînak hatine şîrove kirin. Her wiha me bi awayekî akademîk mînak ji dîwanên Goran sitendiye û li gor rêgezên ravebera şîrove kiriye. Weke ku li jor jî hatiye nivîsîn, raveber, babeteke rêzimanî ye ku rêziman ji bo zimanî gelekî girîng e. Çunku rêziman hokareke sereke ye ji bo parastina ziman. Rêziman hokareke girîng e ji bo standardbûna zimanan çunku rêziman pirsgirêkên nivîsînê çareser dike. Eger her zimanek xwediya rêzimanekê tekûz û hevîrtî be ev ziman tûşî pirsgirêkan nabe.

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

CÜMLEDE YARDIMCI ÖGE OLARAK TAMLANAN UNSURU (ÖRNEKLEM GORAN'IN ŞİİRLERİNİN CÜMLE ÖRGÜSÜ)

Günümüzde dilin en önemli görevi, bilim ve teknolojiyle beraber ilerlemektir. Bugün bilim ve teknoloji günden güne ilerlemektedir bu yüzden dil, toplum için sürekli yeni kelimeler üretmelidir özellikle de sözkonusu toplumun arasına gelen bilim ve teknolojinin yeni unsurları için. Bir milletin dili yeni kelimeler üretemiyorsa sözkonusu dilin sahipleri dillerini zenginleştirmek amacıyla yabancı dillerden kelimeler alır. Bu şekilde dil yabancı dillerin tesiri altına girer ve kendi orijinal kelimelerini bile unuttur. Bundan dolayı zamanla sözkonusu dilin sahipleri akademik anlamda dillerine gereken önemi vermezlerse, o dil ölür. Dil öldüğü zaman, dilbilgisi de ölür ki bu ölü dilin sahipleri başka bir dil kullanmak zorunda kalırlar başka bir deyişle başka bir milletin dilini kullanmak zorunda kalırlar. Dilinin arılığını ve orijinalliğini korumak isteyen bir milletin üyeleri sürekli bir biçimde dil üzerine çalışmalar yürütmelidirler. Bu tez de dilbilgisi üzerine çalışırız, diğer bir deyişle dilbilgisiin bir konusu üzerine çalışıyoruz ki bu “Tamlanan” konusudur. Tamlanan dilbilgisiin konularından bir tanesidir ve oldukça önemli bir konudur. Bu tez de akademik bir biçimde tamlanan konusu üzerine çalışma yapılmıştır, tamlananın türlerinden örnekler alınmış ve sözkonusu örnekler yoruma tabi tutulmuştur. Nitekim çalışmada kullanılan örnekleri Goran'ın şiir kitaplarından aldık ve onları tamlanan konusu çerçevesinde yorumladık. Yukarıda da yazıldığı gibi tamlanan bir dilbilgisi konusudur ki dilbilgisi dil için oldukça önemlidir. Dilbilgisi dilin standartlaşmasında önemli bir etkidir çünkü dilbilgisi yazım ve imlânın problemlerini çözer. Eksiksiz ve uyumlu bir dilbilgisine sahip olan her dil büyük problemlerle karşılaşmaz.

ABSTRACT

MASTER'S THESIS

Modifier as an Adjunct Element in the sentence

(As an Example Goran's Poems)

Today, the most important task of language is to advance with science and technology. Today, science and technology are progressing day by day so the language must constantly produce new words for society, especially for the new elements of science and technology that come into this society. If the language of a nation cannot produce new words, the owners of that language receive words from foreign languages to enrich their language. In this way, the language under the influence of foreign languages and even forget their original words. Therefore, if the owners of the language in question do not give the necessary importance to their language in academic sense, that language dies. When the language dies, the grammar also dies, the owners of this dead language have to use another language, in other words they have to use the language of another nation. Members of a nation that wants to preserve the purity and originality of its language should continuously work on language. In this thesis we study grammar, in other words, we are working on a subject of grammar, which is the subject of 12 Completed Bu. It is one of the subjects of grammar and is a very important topic. In this thesis, the study was completed on the subject which was completed in an academic manner. Samples were taken from the genres and the examples were interpreted. As a matter of fact, we have taken the examples used in the study from Goran's poetry books and interpreted them in the context of the subject. Grammar is a matter of grammar, as written above. Grammar is an important factor in the standardization of language because grammar solves the problems of spelling and spelling. Any language with a complete and harmonious grammar does not encounter major problems.

PÊŞGOTIN

Ziman amrazeke ji bohebûnê,ango eger ziman nebe civak jî nabe, du wateyên bingehîn yê civak û milletan hene, yan zimanê resen yan zimanê eslî yan jî zimanê dayik mirîbe, ku zimanê dayikê nebe yan jî ji nav çûbe, mecbûre ew millet bi zimanê milletên biyanî biaxeve. Ziman hokereke gelekî girînge û çarenûsan saz dike û biryar dide bo berdewamkirina hebûna milletan. Xurtbûn û mezinbûna her milletekî peywendî bi zimanê xwe heye. Ziman sermayeya herî mezin yamilletan e, her milletê ku ji demên kevn de heye divê zimanê xwe parastibe ji bo nifşên piştî xwe yan jî bozarokên milletê xwe re zimanekî tekûz hiştibe. Zimanê her milletekî divê xwe amade bike ji bo metirsîyên derdikevin holê û ji bo ziman bi her hokereke girîng be. Divê ziman xwe biguncîne digel hemî çerx û dem û serdem û hemî cure guherandinan. Her wiha divê xwe biguncîne digel hemî zanist û zanyariyên niha, bo vê yekê divê axeverên ziman her dem bixebitin û çalakî û kor û semînar û li ser wê zanînê were çêkirin ji bo ku her dem ew ziman berev pêşveçûnê ve biçe. Îro di dinyayê de gelek millet li ser zimanê xwe dixebitin gelek ehemiyet û girîngî bi zimanê xwe didin bi boneya ku ew ziman her dem bimîne û berev pêşveçûnê biçe. Her zimanek ji bo ku her hebe û berev pêşveçûnê ve biçe, divê ew ziman xwediyê rêzimanekê taybet be ji bo nivîsandinê. Rêziman bingeh e lewma em dizanin çawa dixebite, her wiha em dizanin çawa berê xwe dide wate û maneyên wê û awayê bi kar anînên wê. Rêziman hoker e ji bo axaftina akademîk û aşkerakirina tiştên nediyar. Rêziman tenê ji bo xwe dûr xistinê nîne ji xeletiyên, lewma têgihiştin û famkirin di rêzimanan de bingeh e, ji bo têgihiştin û famkirina hemî pirtûkekê ye ku ew bi wî zimanê hatiye nivîsîn, ji ber vê yekê em li ser rêzimanê dixebitin. Di nav rêzimanan de me xwast em li ser babetekê bi awayekî akademîk bixebitin. Ev babet Raveber e, ev ji bo xizmet kirin û dewlemend kirina ziman û rêzimana kurdî ye. Her wiha ev nameya me yan ev teza me bingeha wê Raveber e. Karê me an jî xebata me ji destpêk, sê beş, encam û çavkaniyan pêk tê. Xebata me di destpêkê de, di derbarê ziman, zanista ziman, dabeşkirina zimanan, zimanê dayika mirovayetiye,

serdema peydabûnanivîsê, girîngiya rêziman û Raveberan de ye. Di beşa yekem de materyal û metodên xebatê hatine diyarkirin. Di beşa duyem de me li ser babeteke rêzimanî bi awayekî akademîk xebitîn ku ev babet jî Raveber e. Di nav vê babetê de jî me behs li ev babetana dikin ku erka Raveber werdigre, weke, Nasrav, Nenasrav, Kom, Xwedîtî, RaveberaPêş Sere, Morfema Deravêtinê, Morfema Nîşanê, Jimare, Morfema Pirsyariyê, Firêza Rade, Firêza Hevalnava Pileya Bala, Nasnav, Firêza Nav, Firêza Hevalnavê, Firêza Pêşnavê, Komeka Alîkarya Ravebera ya Kirdeyê, Komeka Alîkarya Ravebera Berkar, Komeka Alîkarya Ravebera Raveber, Komeka Alîkarya Ravebera Berkarê Nerasterast, Komeka AlîkaryaRavebera Hevalkar, RaveberaPêş Sereyê û Paş Sereyê. Di beşa sêyem de hozanên Goran me anîye, hemî babetên ku erka Raveber wergirt di beşa sêyem de her yek ji van babetana mînak wergirt, wate hemî hozanên Goran şîrove kir û ev babetên beşa duyem di hozanên Goran di beşa sêyem rola Raveberan destnîşan kiriye. Di beşa encamê de me hemîbabetên di beşa duyem de şîrove kiriye û di beşa sêyem de mînakên ku me ji hozanên Goran wergirtiye û me diyar kiriye bê ka rêjeya van mijaran di helbestên goran de ji sedî çend e. Di beşa çavkanîyan de hemî çavkanî bi awayekî akademîk hatine rêzkirin, ji destpêkê heta navên pirtûkan hatine nivîsîn û piştî wan navê nameyên masteran hatine nivîsîn. Ez dixwazim pir ji dil spasiyên taybet pêşkêşî şeewirmendê xwe birêz Ömer ÇİFTÇİ bikim ku di vê xebatê de piştgiriya herî mezin wî da min, her wiha spasiya birêz Nesim SÖNMEZ dikim ku her dem alîkariyên mezin ji bo xwendekarê xwe didin, her wiha spasiya enstutiya Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim. Ez dixwazim spasiya birêz Xesro Ehmed Resul bikim ku di vê xebatê da piştgiriya mezin wî da min, herwiha spasiya ev mamosta û hevalên xwe dikim ku wan di ev xebata me de piştgiriya me kirin.

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET.....	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
NAVAROK.....	VI

DESTPÊK :1. MATERYAL Û METOD	1
1.1. Materyal.....	1
1.2. Metod.....	2
1.2.1. Modela Lêkolînê	2

BEŞA YEKEM :2. ZIMAN BI AWAYEKÎ GELEMPERÎ.....	3
2.1. Di Derbarê Ziman de	3
2.2. Zanista Ziman	3
2.3. Dabeş Kirina Ziman	4
2.4. Derketina Zimanan	4
2.5. Dîroka Nivîsî ya Zimanan	5
2.6. Mirov Çawa Hînê Ziman Dibin	6
2.7. Ziman di Serdema Îro de	6
2.8. Girîngiya Rêzimanê.....	7
2.9. Raveber.....	7

BEŞA DUYEM:3. TÊGEH Û PÊNASEYA HEVOKÊ.....	9
3.1. Hevoksazî-Ristesazî	9
3.1.1. Raveber	9
3.1.2. Kirde-Biker	10
3.1.3. Ravebera Kirdeyê-Diyarxerî Bikerî.....	10
3.1.4. Berkar.....	10
3.1.5. Ravebera Berkarê Rasterast-Diyarxery Berkaey Rastewxo	11
3.1.6. Ravebera Berkarê Nerasterast-Diyarxery Berkaey Narastewxo.....	11

3.1.7. Temamker	11
3.1.8. Lêker-Kar	12
3.1.9. Dengdêr-Awellguzar	12
3.1.9.1. Dengdêra Demî-Awellguzara Demî	13
3.1.9.2. Dengdêra Cihî -Awellguzara	13
3.1.9.3. Dengdêra Çawaniyê-Awellguzara Çawaniyê	13
3.2. Raveber Weke Amrazeke Hevokî-Diyarxer Weku Keristekî Risite	14
3.2.1. Nasrav	15
3.2.1.1. Morfema Nasrav (ke) yê	16
3.2.1.2. Morfema Nasrav ya (eke) yê	17
3.2.1.3. Morfema Nasrava (yeke) yê	17
3.2.1.4. Morfema Nasrav ya (e)yê	18
3.2.2. Nenasrav –Nenasraw	18
3.2.2.1. Morfema Nenasrav ya (êk) ê	20
3.2.2.2. Morfema Nenasrav ya (ek)ê	21
3.2.2.3. Morfema Nenasrav ya (yek)ê	22
3.2.2.4. Morfema Nenasrav ya (ê)	23
3.2.3. Morfema Komê	24
3.2.3.1. Morfema (ekan)ê	27
3.2.3.2. Morfema (an)ê	28
3.2.3.3. Morfema (yan)ê	29
3.2.3.4. Morfema (at)ê	29
3.2.3.5. Morfema (eha)yê	29
3.2.4. Morfema Nasrav û Komê	30
3.2.4.1. Morfema (ekan)ê	31
3.2.5. Morfema Nenasraviyê û Komê	31
3.3.5.1. Morfemên (an+êk, at+êk)	32
3.2.6. Morfema Xwedîtiyê (possessive)	33
3.2.6.1. Morfema (m)ê	34
3.2.6.2. Morfema (man)ê	35
3.2.6.3. Morfema (t)ê	36
3.2.6.4. Morfema (tan)ê	36
3.2.6.5. Morfema (î-y)ê	37
3.2.6.6. Morfema (yan)ê	37

3.2.7. Nasrav û Xwedîtî (possessive).....	38
3.2.7.1. Morfema Nesravya Xwedîtîyê ya (yeke)+(m_man, t_tan, î-y_yan) ..	40
3.2.8. Morfema Nasravya Koma Xwedîtîyê	41
3.3. Ronana Derveyê Firêza Navî	42
3.4. Ravebera Pêş Sere	44
3.4.1. Morfema Deravêtin-Morfema Derhawîştin	44
3.5. Morfema Nîşaneyê	46
3.5.1. Morfema Nîşaneyê ya (ewe)yê	46
3.5.2. Morfema Nîşaneyêya (emane)yê	47
3.5.3. Morfema Nîşaneyêya (eme)yê.....	48
3.5.4. Morfema Nîşaneyêya (ewane)yê	48
3.6. Hejmar-Jimare	49
3.6.1. Hejmara Bingehîn-Jimareî Bincî	49
3.6.2. Hejmara Rêkxistinê.....	50
3.6.3. Hejmara Parçeyî – Jimareî Kertî.....	52
3.7. Morfema Pirsyariyê	53
3.7.1. Morfema Pirsyariyê ya (kam-kîjan)ê.....	53
3.7.2. Morfema Pirsyariyê ya (çend)ê.....	54
3.8. Firêza Rade yê	54
3.8.1. Firêza Radeya (hemû)yê	56
3.8.2. Firêza Radeya (zor)ê	57
3.8.3. Firêza Radeya (hendêk)ê	57
3.9. Firêza Havelnava (Hawelnawa) Pileya Bilind	58
3.10. Firêza Hevalkar	59
3.11. Nasnav	60
3.12. Çend Raveberake Pêş Sereyê	61
3.13. Raveberan Paş Sereyê.....	62
3.13.1. Firêza Navê	62
3.13.1.1. Hatina Raveberek li Paş Sereyê	63
3.13.1.2. Hatina Çend Raveberan li Paş Sereyê.....	64
3.13.2. Firêza Hevalnav (Hawelnaw)	64
3.13.3. Firêza Rade	66
3.13.4. Firêza Pêşnav (Prepositional Phrase).....	67
3.13.5. Firêza Hevalkar	68

3.13.6. Morfema Pirsyariyê	68
3.13.7. Komeka Alîkar (Dependentcayse).....	69
3.13.7.1. Komeka Alîkar ya Ravebera ya Kirdeyê	69
3.13.7.2. Komeka Alîkar ya Ravebera Berkar	70
3.13.7.3. Komeka Alîkar ya Ravebera ya Berkarê Nerasterast.....	71
3.13.7.4. Komeka Alîkar ya Ravebera Raveber.....	71
3.13.7.5. Komeka Alîkar ya Ravebera ya Lêkerê	72
3.13.7.6. Ravebera Pêş Sereyê û Paş Sereyê.....	73

BEŞÎ SÊYEM:4. PIRAKTÎK KIRINA RAVEBER DI HOZANÊN GORAN... 74

4.1. Morfema Nasrav	74
4.2. Morfema Nenasrav	75
4.3. Morfema Komê	78
4.4. Morfema Nasrav ya Komê	80
4.5. Nenasrava Komê	80
4.6. Xwedîtî	80
4.7. NasravaXwedîtîyê	81
4.8. Nasrava Kom û Xwedîtîyê	81
4.9. Deravêtin	82
4.10. Morfema Nîşanê	83
4.11. Jimare	84
4.12. Morfema Pirsyariyê	88
4.13. Firêza Rade	90
4.14. Hevalnav Pileya Bilind.....	91
4.15. Nasnav	91
4.16. Hevalkar	92
4.17. Zêdetir ji Raveberekê	93
4.18. Nav	94
4.19. Hevalnav.....	102
4.20. Firêza Rade	111
4.21. Pêşnav.....	112
4.22. Hevalkar	112
4.23. Morfema Pirsyariyê	112
4.24. Komeka Alîkarî ya Ravebera Lêkerê	113

4.25. Komeka Alîkarî ya Ravebera Berkarî ya Rasterast.....	116
4.26. Komeka Alîkarî ya Ravebera Berkarî ya Nerasterast.....	116
4.27. Komeka Alîkarî ya RaveberaRavebera	116
4.28. Komeka Alîkarî ya Ravebera Hevalkar.....	117
4.29. Ravebera Pêşî Sere û Piştî Sere	117
ENCAM.....	120
ÇAVKANÎ.....	123



DESTPÊK

1. MATERYAL Û METOD

1.1. Materyal

Navê Sere babetên Rêzimanî ku di vê tezê da hatine bikaranîn bi vî awayî ne:

1. Nenasrav
2. Nasrav
3. Kom
4. Xwedîtî
5. Ravebera Pêş Sere
6. Morfema Derevêtin
7. Morfema nîşaneyê
8. Jimar
9. Morfema Pirsyariyê
10. Firêzî Rade
11. Firêza Hevalnavê Pileya Bala
12. Nasnav
13. Firêza Navê
14. Firêza Hevalnavê
15. Firêza Pêşnavê
16. Komeka Alîkarya Ravebera ya Kirde
17. Komeka Alîkarya Ravebera ya Berkar
18. Komeka Alîkarya Berkara Nerasterast
19. Komeka Alîkarya Ravebera Raveber
20. Komeka Alîkarya Hevalkar

21. Ravebera Pêş Sere û Paş Sere

1.2. Metod

1.2.1. Modela Lêkolînê

Di lêkolînê de bi bikaranîna ji rêbazên teorîk û rêbazên piraktîzekirinê di vê tezê de hatîye bi kar anîn. Bi alîkariya rêbazên teorîk me behsa raveberan kiriye û bi awayekî akademîk ji wan mînak daye û me ew mînak şîrove kirine. Her wiha ji ber vê babetê me rêbazên teorîk bi kar anîye çunku ev babet pêdivî bi vê rêbazêdike. Her wiha bi awayekî akademîk rêbazên piraktîzekirinê jî hatine bi kar anîn. Rêbazên piraktîzekirinê di beşa sêyem hatine bikar anîn çunku di beşa sêyem de mînak ji hozanên Goran hatîne wergirtin piştî vê yekê hatine şîrove kirin. Her wiha ji ber vê babetê rêbazên piraktîzekirinê hatîye bi kar anîn çunku ev pêdivî bi vê rêbazê dike.

BEŞA YEKEM

2. ZIMAN BIAWAYEKÎGELEMPERÎ

2.1. Di Derbarê Ziman de

Ziman pergaleke kevneşopî ye ku destûr an jî sembolên nivîskî ye û bi destê mirovan hatiye sazîkirin. Endamên civakê bi rêya ziman beşdarî çanda xwe dibin û pê hest, raman û rewşa xwe diyar dikin. Her wiha ziman amûreke bingeîn ya civakîbûnê ye ku îfadeya nasnameyê, lîstîk, îfadeya fikrî, û serbestberdana rexneyî di nava fonksiyonên wê de hene. Ziman yek ji amûrên herî girîng ên têkilî, têgihiştin û ragihandinê yekû di gelek qadên jiyana de û di nav civakê de, bêtir ku ji bo çalakiya kesayetiyê ya kesayetiyê bînpêkirin cih digre. Her ziman di cîhanê de bi têkiliyên mirovan re têkildar e ku fikrên mirov herdem bi riya ziman û derfetên ziman tê derbirin. Bi saya van derfetên zimanî awayên têkilîdanîna mirovan jî xurttir bû, vê yekê tesîr li pêşveçûna mirovayetiye kir û bû sedem ku mirovahî zêdetir bi qedrê gotinê zanibe. Ziman di demên kevn de hate diyarkirin, wekî komên dengên ji armancên kesan û hewcehiyên wan kesan tesîr girt û bi vê yekê re ji bo pênasîya ziman û fonksiyonên wê bergehên din bexşî mirovan kir. Psikolog dîzanîbû ku ziman wekî îşaretek derbasdar bi kêrîfidekirina daw û dozên mirovan, rewşenbîrîya wan û derbirîna rewşa wan a derûnî tê. Bi awayekî din mirov dikare bibêje ku wek analîzîkirina ramanên mirovan, ziman xwediyê gelek kod û şîfreyan e ku ev kod û şîfre bi pêşveçûna zanistê re bi rêya nivîsê xwe da der.

2.2. Zanista Ziman

Deng derbasî her nîşî dibe ji nîşên ku endamê wan kesên li ser hişê xwe ne, an jî ev peyvê diaxivin û pê kar dikin di nav hemû xelkê de hene. Ev name ji vê lêkolînê yê zimanan, ku nexweşxaneyêke taybetî ye ku tê de bi sedan pîspor û akademîsyen û bi zimanê ku bi vê zanistê danasîn e. Hejmara yê zimanan niha, ya herî girîng jî, li gor texmînkirina akademîsyenên zanîngeha Ûppsalayê hejmara zimanên ku niha tê axaftin sê hezar ziman e. Gelek ji van yê ku bi zimanên ku ji

aliyê çend kesên bi sînor, kij ziman bi zêdetir ji yek milyon kesan per zimanê hinekî li ser zimanê sedî ye.

2.3. Dabeşkirina Zimanan

Ziman bi giştî derî ye bo têketina odeyên neteweyên din. Ziman bi armanca peywendîdanîna di nav gelan de hatiye çêkirin. Bi hezaran salan ev yek her wisa bû. Peywendiyên di nav wan gelan de aşkera dike ku di derbarê çêbûna zimanan de ferheng, dîn û ayîn, zanist, şer, têkiliyên aborî, coxrafî, dûrketina ji hev ya milletan hokarên gelekî girîng in ji bo jihev cudabûna zimanan û durustbûna zarave û devokan nû. Temamê zaraveyan bi derbasbûna demê re hindek zarava ji kokên xwe yên kevn dûr dikevin û dibin zimanên nû. Her wiha hindek zimanên ku derfeta berdewamkirinê nedîtine dimrin. Weke mînak, zimanê somerî, avestayî, latînî, frîgî, sanskrîtî û gelek zimanên din ên qedîm ji holê rabûne. Dema ku em vedigerin demên borî bi awayekî vekirî em dibînin ku hemû ziman nêzî hev dibin. Wek mînak, zimanê elmanî di dema niha de digel zimanên ewrûpî yên din xwedî cûdahiyên gelekî berbiçav e lêbelê di rabirdûyê de zimanê elmanî gelekî nêzî zimanên din ên ewrûpî bû. Her wiha zimanê kurdî jî îro hinekî nêzî zimanê farisî ye lêbelê di rabirdûyê de nêzbûna wan zêdetir bû. Di encama şer û dagirkirina hîndîstanê ji hêla îngîlîzan ve di sedsala 18em de bi derbasbûna demê re zimanê îngîlîzî tesîr li ser zimanê hîndî kiriye. Girêdayî vê yekê dema zimanzanên îngîlîz li ser sanskrîtî ango zimanê hîndîyan xebitîn rastî taybetmendiyên her du zimanan yên hevpar hatin. Vê yekê di xebatên paşê bi taybet yên li nav zimannasên elmanan de kir ku li ser dabeşkirina zimanan xebatan bikin. Di derbarê dabeşkirina zimanan de nîqaşên dijber hêjî hene lêbelê mirov dikare bibêje ku ziman bi du awayan hatine dabeşkirin: Dabeşkirina ji aliyê kokan ve û dabeşkirina ji aliyê formî ve. Ziman ji aliyê kokan ve kom bi kom hatine dabeşkirin, weke malbata zimanên hînd-ewrûpî, malbata zimanên hamî û samî û hwd. zimanê kurdî di nava malbata zimanên hînd-ewrûpî de de ye.

2.4. Derketina Zimanan

Kok û bingehen zimanên mirovan û cûrbecûriyan mijareke têra xwe zehmet û tevlihev e. di derbarê vê yekê de gelek xebat hatine kirin lêbelê ta niha encameke

ku karibe lihevkirineke giştî pêk bîne derneketiye holê. her wekî çêbûn û afirandina cîhan û mirovan, çêbûna zimanan jî bûye mijara hindek efsane û mîtan. Ji nav vana ya herî berbelav efsaneya burca babîlê ye. efsaneya burca babîlê di nav gelek çand û olan de berbelav e. heta sedsala 18em jî gelek kesan baweriya xwe bi wê efsaneya di derbarê çêbûna zimanan de dianî. Li gor vê efsaneyê xwedê ji quretiya wan mirovên ku dixwestin xwe bigihîjînin wî aciz dibe û zimanê mirovan yê heta wê demê bi hev re têkiliyê datanîn têkilhev dike û bi awayî rê li ber fêmkirina wan a ji hevûdû digre. Li gor efsaneyêke din a berbelav jî li cîhana ku xezeba xwedê lê bariyaye lehiyek radike û di encama vê yekê de mirovên ku ji vê karesatê filitîne bi zimanên ji hev cuda axivîne û bi vî awayî çand, ziman û zaraveyên cuda derketine. Kokên zimanê mirovan demeke gelekî dirêj e di nav zimannasan de bi awayekî berfireh tê nîqaşkirin. Li gor zimannasan pêşiyên mirovan ji parzemîna efrîqayê li cîhanê belavbûn e. dema koçkirine dengên ku kêr dihen bikaranîn jî li pey xwe hiştine û vê yekê kiriye ku li cihên nû bi tesîra gelek faktorên bo têkilîdanînê ziman derkevin holê. bi demê re sîstema van zimana runîşt, rêgezê wan ên zimanî diyar bû û hindek ji wan bûn zimanê nivîsê jî ku em bi xêra wan belgeyên kevn ên zimanî û herwiha berhemên arkeolojîk di derbarê çêbûn zimanan da lêkolînên berfireh dikin.

2.5. Dîroka Nivîskî ya Zimanan

Nivîs yek ji wan amûrên herî girîng e ku mirov pê hest, daxwaz û armancên xwe pê îfade dikin. sembol û îşaretên diyarkirî hene ku evana sîstema nivîsê pêktînin. Mirov dikare bibêje ku nivîs îcada herî karîger e di dîroka mirovahiyê de. Gelek pispor bi awayekî eşkere diyar dikin ku pêşveçûna zanist û teknolojiyê bi xêra derfetên nivîsê ye. çûnku nivîs tiştan, buyeran, dîrokan qeyd dike û nahêle ew werin jibîrkirin. Nivîs ji hêla kesekî ve bi tena serê xwe nehatiye îcad kirin. îcadkirina nivîsê girêdayî gelek sedeman bû ku aborî, rêvberin, ol û daxwaza derbirînê ji wan hindek in. Hindek lêkolîner angaşt dikin ku nivîs ewwîlî di nava misrîyên kevn de derket, ew bo vê yekê rismên hiyeroglîfî nîşan didin bes ji ber ku sîstemek e diyar ya wan risman nîne ew rismên ku tê din hin tişt bi riya simbolan dihate vegêran weke sîstemeke nivîsê nayê qebul kirin. li gor gelek kesan nivîs ewwîlî li mezopotamyayê ji hêla somerîyan di beriya zayînê 3300an de hatiye îcadkirin ango belgeyên nivîskî

yên herî kevn ji wê dewrê ne. Paşê bi rêya têkiliyên şerî, olî û bazirganî nivîs li cografyeyên din belav bû û vê yekê kir ku gelek sîstemên nivîsê derkevin.

2.6. Mirov Çawa Ziman Hîn Dibe

Mirov çawa ziman hîn dibe pirseke ku pedagog û zimannas serê xwe pê diêşînin e. Mirov ji zarokatiyê ve bi awayekî xwezayî û bi lezgîniyê hîn zimanan dibin. Her mirov pêwistî bi wê yekê dike ku hewcehiyên xwe yên şexsî û civakî ji derdora xwe re diyar bikin, ev yek him bi guhdarî kirina derdorê û bi taybet jî teqlîdkirina dengên mezinan pêk tê. Piştî re ji bûyer û qewimînên li der dora xwe hîn bibin ku dengên ku di nav civaka wan de bi rêya ziman tê derbirrîn hînî bikar anîna sîstema dengên ango axaftinê dibin. Her ziman bêtir guhertina qaîdeyên xwe, peyvan û nimûneyên dengên li gor xwezaya xwe hildibijêre û sîstemeke hevgerî ya axaftinê pêk tîne ku bi bikaranîna vê sîstemê re ziman ji nîşkekê derbasî nîşkekî din dibe. Sîstemên civakî yên wek malbat, medrese, camî, dêr û di dema modern de dibistan cihên sereke yên zimanan e. ev pêvajoya hînbûna ziman ya zarokan hê di wê dema ku di zikê diya xwe de ne dest pê dike. Zarok eng û sewtên derdorê bêhemdî xwe hîn dibin û bi demê re piştî organên wan ên axaftin û têgihiştinê dikemmilin dest bi axaftinê dikin ango pêvajoya hînbûyîna ziman dest pê dike. Zarok di nava xwazaya xwe de xwe bi xwe hîn ziman dibin. Ango li wê derdorê, li nav malbatê kîjan ziman hebe zarok bi tesîra derdora xwe hîn wî zimanî dibin. Di roja îro de lêkolînên li ser hînbûna zimanan berdewam dikin û bi rêya pêşdibistan û dibistanan pêvajoya hînbûyîna zarokan ya zimanan baştir tê dîtin.

2.7. Ziman di Serdema Îro de

Karê herî girîng ya zimanê ew e ku niha di pêşveçûn û pêşketina xwe bi pêşketina zanistî û teknolojiyê re bike û li dû wan nemîne. Bêguman ti zimanek nîne ku daxwazên demên teknolojik nikaribe bibersivîne. Her zimanê ku xwediyê derfetên sazûmanbûnê ye dikare li gor pêşketinên zanist û teknolojiyê xwe nû bike û peyv û îfadeyên nû çêbike. Ji ber vê yekê mirov bi rehetî dikare bibêje ku zimanek bihêz nîne bes zimanê ku derfetên pêşveçûnê nedîtiye heye. Lewre hindêk zimanan nekarîne li gor serdemê xwe bipêş ve bibin û li pey zimanên xwedî her cure derfetîne

mane. Ger zimanek zindî ji ber hindek sedeman bimire, rêzimana wî zimanî jî dimire û ew axeverên wî zimanî mecbûr dibin ku zimanê xwe biguherin (Mehemed Hamir Cewad, 1995). Ji ber şerên mezin, koç kirin, karesatên xwezayî û ji ber bandora çandên cîran ên mezin hindek ziman dikevin bin xetereya mirinê. Di serdema îro de gelek ziman hene ku xeteraya mirin wan ji hêla Unescoyê ve hatiye diyar kirin.

2.8. Girîngiya Rêzimanê

Rêziman zanistek ku bi giştî li ser binemayên deng, form û hevokên zimanan dixebite û rêzik û yasayên wê tespît dike. Rêziman sistemeke gelekî girîng e di rast axaftin û rast nivîsandina her zimanî de. Çunku rêziman rê li ber şaşî û tevliheviyên xelet digre û bi vî awayî ziman diparêze. Ji demên gelek kevin de aliman girîngîya rêzimanê ferq kirine û di derbarê wê de hindek xebat kirine. Ev yek kir ku awayê xebitîna zimanan pirr zû were fam kirin û rêzik û yasayên zimanan diyar bibe. Zimanên ku rêzik û yasayên wan li gor ilmê rêzimanê nehatibe diyarkirin zû dikevin bin tesîra zimanên derdora xwe û hêdî hêdî taybetmendiyan xwe yên xweser wenda dikin. her wiha rêziman bo standardkirin û yekkirina zimanan jî rolên girîng dilîze. Çunku dema rêzimanek ku rêzik û yasayên wê diyarkirî tune be ziman zû bi zû dabeşî ser zarave û devokan dibe. Zimanên xurt ew zimanin ku xwediyê rêzimanek tekûz in. Mirov fikr, raman, hest û dxwazên xwe bi rêya ziman û nivîsê derdibirrin. Ger ev derfetên derbirrînê qels an jî xelet werin bikaranîn wê demê peyamên ku tê dayîn jî nagihêjin armanca xwe. Ji ber vê yekê her miletê xwedan şiyana û derfet bo zimane xwe saziyên fermî yên wek zanîngeh, enstîtu, navendên lêkolînê vedikin da ku rêzik û yasayên zimanê xwe teqez bikin û bi awayekî rast û durust hînî zarokên xwe bikin. Ev yek tesîrê li ser jiyana civakî, hunerî, felsefî, olî, edebî û çandî jî dike û dibe sedem ku ew civak bipêşkeve, nêzî her cure armancên xwe bibe.

2.9. Raveber

Raveber, babeteke ji babetên rêzimanê, bi awayekî gelemperî babeteke gelekî girîng e di nav rêzimana kurdî de. Lêkolînerên zimanê kurdî wek babeteke gelekî mezin dizanin û li gor vê xebatan li ser dimeşînin. Ev yek ji bo naskirin û diyarkirina

taybetmendiyên kurdî karîger e. Raveberkomek babetên din ên rêzimanî di nava xwe dihevwîne wek mînak, nasrav, nenasravî, cînavk, jimare û hwd. Ji ber vê yekê me jî ev babeta ravebera bo xebata masterê hilbijartîye. Em ê di xebata xwe bi taybetî di hozanên Goran' de li ser mijara ravebera bixebitin. Hozanên Goran derfet û amûrên girîng didin lêkolînên li ser rêzimana kurdî. Di vê çarçoveyê de em ê ewwîlî li ser pirtûkên rêzimana kurdî hûr bibin û bi alîkariya çavkaniyên teorîk re lêkolîna xwe bikin. Bêguman ev yek dê di famkirina û şîrovekirina hozanên Goran' de daneyên nû bide me bê ka Goran zimanê kurdî bi taybetî jî babeta ravebera bi çi awayî di hozanên xwe bikaranîye.



BEŞA DUYEM

3. TÊGEH Û PÊNASEYA HEVOKÊ

3.1.Hevoksazî-Ristesazi

Hevoksazî bi kurtî zanisteke ku firêz û komeka alîkarya peyvên dikole. Hevoksazî û peyvsazî beşek in ji zimên, ango bi hev re zimên pêktînin (ev zarave ji “Sentaks”ê hatiye ku zaraveyeke Yunanî ye, tê wateya “danîn, rêkxistin”, paşê ketiye zimanê Înglîzî jî), (Abdulrahman Hacı Marif, 1954; 20), ango erka hevokê girêdana peyvê ye di nivîsandin û axaftinê de. Zimannas û nivîskaran ta niha çendî pênaseyên cuda cuda ji hevokê re kirine. Em ê di vira de hinek ji van pênaseyan tînin berbehsan. Di kovara (Kora Zanyarî)yê de bi vî awayî pênaseya hevokê kirine (Hevok zincîre peyvek in têgeheke temam nîşan didin), (Desteya ziman, kovara Kora Zanyarî, hejmar 161, 1986). Her wiha (Hevok komelek peyvên rêkxistine ji bo mebestek li gorî zagona zimên), (Nesrîn Fexrî, 2002; 12). her wiha (Hevok tê wateya rehê lêker û pêwîstiyên hevokê), (Abdullah Hwsen, 2006; 4). Di van pênaseyên jorîn de ji me re xuya dibe ku gerek hevok wateyeke temam nîşan bide.

3.1.1.Raveber

Weke alavên din ên hevokê-diyarxer wek keresteyên din risteya raveber di hevokê de rola zelalkirinê dibîne, hevoka serekê zêdetir zelal dike, aliyê fêmkirinê ji me re dide naskirin, hevokê ji hevoka xwerûyî dike hevoka têkelî (hevoka Raveber nesereke ye, tenê rol dibîne û tenê jî nayê bikaranîn, jiber ku tenê be wateyê nade, ew girêdayî peyvên derdora xwe ye), (Awrehman Hacı Marif, 2014; 55). Ango raveber erka zelalkirina peyvên derdora xwe werdigire di hevokê de, yan jî ji bo fêmkirina zêdetir e di hevokê de.

3.1.2. Kirde-Biker

Ev nav yan jî ev cînavk e ku di hevokê de rola kesek yan jî tiştekî nîşan dide dema ku karek encam dide, ev erk bi bûn yan jî nebûna di hevokên Kurdî de, li gorî pênaseya giştî ya rêzimanî dikeve destpêka hevokê. Kirde du cure ne, kirdeya rêzimanî û kirdeya mantiqî, lewma di kirdeya rêzimanî de (ew kirde rêzimanî ye ku di hevokê de li gorî zagona sîtakîsên zimanî cihê kirdeyadigirin), (Wîrya Omer Emîn” rûpel: 14, sal: 2015). Her wiha di derbarê kirdeya mantiqî de (ew kirde rêzimanî ye ku karê hevokê encam dide, merc nîne jî ku cihê rêzimanî ya xwe bigire), (Quirk Etal, 1985; 23), di hevokê de kirde bi tenê rol nabîne, belkî di hevokê de çendîn alav pêre rol dibînin, her wextek kirde di hevokê de heye wê demê alavên din jî pêre tên.

3.1.3. Ravebera Kirdeyê-DiyarxerîBikerî

Hevoka kirdeyê ji du pêkhateyên sereke pêk tên ku ew jî paja kirdeyî û paja lêkerî ne, paja kirdeyî herdem li dewsa navê tê, paja lêkerî jî herdem li dewsa firêza kiriyariyê tê, (xwerûtirîn hevokê ji du pajanpêk tê, firêza navê û firêza kiriyariyê), (Wîrya Omer Emîn, 2004; 99). Her wiha (nav di hevoka serekê de rolakirdeyê dibîne, lewma raveber vê navê zêdetir zelal û diyar dike û rola kirdeyê dibîne, her wiha hevoka têkelîjî saz dike), (Bazyar Yunis mehîdîn, 2010; 83). Di derbarê vê yekê de em ê hewl bidin bi mînakên zêdetir vê mijarê zelal bikin. Mînak, Arî ke êsta le qutabxaneyê, nîwero dêtewe. Di nav ev tekiste peyva(ary)kirde.

3.1.4. Berkar

Ev amraz e ku dikeve bin bandora kiriyara lêkerê di hevokê de li gorî zagona rêzimanî ya Kurdî û di rêzimana Kurdî de du cureyên berkar hene (berkarê rasterast û berkarê nerasterast), (Şukriye Resûl, 2004; 71). Bi vî awayî li jêr em ê zelal bikin, Naz Namey nusy, peyva (name) berkare.

3.1.5. Ravebera Berkarê Rasterast-Dyaxery Berkaey Rastewxo

Lêkolînerên li ser rêzimanê dixebitin çî Kurd û çî jî yê biyanî di derbarê berkarê rasterast axivîne(berkarê rasterast di firêza kiryarî de kara ye), (Muhemed Mehwî, 158, 2001).Her wiha (berkarê rasterast di encama bersiva ‘Kî û Çî’ tê û bi alikariyê amrazekê vî karî li ser tê pesekirin), (Awat Yadgar Tofîq, 1998; 76).Her wiha(berkarê rasterast peyvendiyeke rêzimanî ye ku bi sedema (girêya navî) peyda dibe û di ‘girêya karî’ de derdikeve), (Ty Ask, 1993; 17). Di tevahiya pênasêya vê têgehê de berkarê rasterast ev girêya navî ye ku di bin bandora hevokê de ye û hevokê jî giştgir dike û dibe bersiva ‘kî yan jî çî. Her wiha (berkarê rasterast tevî hevokên aloz dibe ango berkarê rasterast dibe Raveber di hevokê de), (Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, 1980; 13). Mînak, Ew Partukî kirîwe, di nav ev tekste peyva (Pertuk) berkara rasteraste.

3.1.6. Ravebera Berkarê Nerasterast-Diyaxery Berkaey Narastewxo

Bi heman awayî ya berkarê rasterast, lêkolînerên Kurd û lêkolînerên biyanî jî di derbarê berkarê nerasterast axivîne û nêrinên xwe anîne zimên, (berkarê nerasterast bi awayekî di bin bandora firîzekê kiryarî de ye),(Muhemed Mehwî,2001; 158).Her wiha nivîskarekî din jî dibêje,(berkarê nerasterast berkareke ku bandora karê derbas dike, piştî ku ji berkarekî din derbas bûye), (Muhemed Elî Elxulî, 1982; 129).Her wiha derbarê berkarê nerasterast nivîskarekî din jî dibêje, (eger berkar bi awayekî nerasterast di bin bandora karê de be, wê demê bi tevahî jêre dibêjin berkarê nerasterast),(Cek Rîçard Can Plet Hayd Fîber, 1996; 378).Di vê pênasêya de ji me re xuya dibe ku berkarê nerasterast bi sedema amraza peyvendiye saz dibe, jêre dibêjin ‘girêya bend’ ev di bin bandora hevokê de û bi sedema (be-bo-le-legel) li kêleka berkarê rasterast de derdikeve. Mînak, Aştî naneke bo Ferhad debat, peyva (Ferhad)berkarê nerasteraste.

3.1.7. Temamker

Temamker mijareke yan amrazekê rêzimanî ye, di nivîsandin û axaftinê de heye û di hevokê de roldar e. Di vê derbarê de nivîskaran diaxivin û dibêjin,(Temamker ew amraz in ku bi kiryarê re tên û hevokê dikin hevokekê

rêzimanî û wateyeke temam jêre didin),(Muhemed Omer, 2008; 28). Ango ew amraz in ku cihê temamker tijî dikin û di dema jêbirina di hevokê de, hevok wateya xwe ji dest dide, lewma erka temamkerê wê peyvendiyeke rasterast bi kiryara temamkerê re hebe. Ango pajeke sereke ya hevokê ye, vedigere vê regeza ku di pêkanîna beşa lêker de heye neku beşalêker bixwe, hebûn û nebûna temamker bi sedema kiryarên xwe ya ferhengî di firêza Lêkerî de derdikev,(Temamker di hevokê de pêwîstîyeke girîng e, nabe bê terkkirin),(Sacîd Abdullah Ferhadî, 2013; 29).Di çarçoveya vê mijarê de bi mînakên zêdetir em ê zelal bikin.

Mînak, Min ewanim be dost zanî, peyva (be dost)temamker.

3.1.8.Lêker-Kar

Pajeke sereke ya hevoka rêzimana Kurdî ye, roleke mezin dibîne di pêkanîna hevokê de, nabe bê terkkirin.Her wiha roleke girîng dibîne di amrazên rêzimana Kurdî de, ji kirdeyê bihêztir e, ji ber ku gelek ji amrazên rêzimanî dikarin cihê kirdeyê tijî bikin wekî, (nav, cînav, dengdêr) lê ti amrazekê din nikare cihê lêkerê tijî bike û gelek caran lêker dikare cihê kirdeyayî tijî bike weke (hat). Eger em seyir bikin ji van pênasayên nivîskaran ku ji lêkerê re kirine, ji xwîneran zêdetir diyar dibe ku (lêker peyveke serbixwe ye), (Seîd Sidqî Kababy, 1946; 24).Her wiha(Lêker peyveke ku rewş û rûdana tiştekî di demekê de behs dike), (Tewfîq Wehbî, 1956; 16). Her wiha di derbarê lêkerê de nivîskarên din yan jî zimannasên din jî di derbarê wê de axivîne û dibêjin,(lêker ew paj e yan ew bêje ye diyar dixe ku kirde çi karekî kiriye yan jî çi dike), (Nûrî Elî Emîn, 1960; 38).Her wiha (lêker pajeke ji pajên axaftinê ku rûdan û dem têde heye), (Ebdulrehman Hacî Marif, rûpel, 2000; 99). Ango ji xwîner û nivîskaran diyar dibe ku(lêker) roleke girîng dibîne di zimanê Kurdî de, her wiha dema rûdana lêkerê zelal dike û awayê karî bi guhdarvan yan jî xwîneran dide nîşandan, weke vê mînaka, Aram nûsîn dekat, (dekat) lêkere.

3.1.9.Dengdêr-Awellguzar

Di zimanê Kurdî de ji bilî bêjeya dengdêr anku awellkar, bêjeyên awellfirman û hawellkar) jî jêre tê gotin, nivîskaran û şarezayên warê zimên bi vî awayî jêre gotine awellguzar (yek ji kêşeyên girîng ên sentaks, nedanîna sînor e di navbera

awellkar û awellguzar), (Kurdistan Mukiryanî, 1986; 155). Ango awellguzar di piraniya mijarên zimên yan jî çavkaniyan de weke mijareke serbixwe hatiye behskirin. Her wiha (nesereke ya hevokê ye û wekbar tê dîtin, ji ber ku jêbirina wê nabe sedema sazûna hevoka nerêzimanîyê), (Xesrew Ehmed Resûl, 2007; 35). Angoawellguzar ew paja axaftinê ye ku peywendiya wê rasterast bi lêkerê re heye, ji aliyê çawaniya ‘dem, cih, curê bûyerê’ yan jî her mijareke din di hevokê de), (Sadiq Behadîn, 1978; 17). Her wiha awellguzar ronana tevî hevokê dike û alîkariya lêkerê dike, her wek şarezayên zimanî dibêjin, (awellguzar amrazêke erka berfirehkirina hevokê dibîne, lewma amazeke nesereke ya hevokê ye wekbar tê dîtin û pajeke ji girêya lêkerê û aliyekê lêkera hevokê zelal dike, her wiha awellguzar ji aliyê naverokê ve dibe çend cure.

3.1.9.1.Dengdêra Demî-Awellguzara Demî

Ev curê awellguzar dema rûdanê zelal dike, jêre dibêjin awellguzara demî, di mînaka ku li jêr hatiye dayîn ev mijar dê zelaltir bibe.

Mînak: Kiçeke em sal le dayik bû. Peyva (em sal) dengdêre raveber e ji bo peyva kiç

3.1.9.2.Dengdêra Cihî -Awellguzara

Dengdêra cihî ew curê awellguzar e ku cihê rûdana lêkerê nîşan dide yan jî zelal dike, di mînaka ku li jêr hatiye dayîn ev mijar dê zelaltir bibe.

Mînak:Rawêj le şarewanî dexwênêt, peyva (leşarewanî), dengdêra cihîye raveber e ji bo peyva rawêj.

3.1.9.3.Dengdêra Çawaniyê-Awellguzara Çawaniyê

Ew curê awellguzar çawaniya lêkera nava hevokê zelal dike, di mînaka ku li jêr hatiye dayîn ev mijar dê zelaltir bibe.

Mînak: Karox be Seyare roî, peyva (be seyare), dengdêre çewantîye raveber e ji bo peyva karox.

3.2. Raveber Weke Amrazeke Hevokî-Diyarxer Weku Keristekî Risite

Raveber peyveke ji navê wê re xuya ye ku ravebera hevoka sereke ye yan jî hevokeke têkel e. Her wiha dibe ev nav yan jî ev pêkhata ku rola sereke bibîne yan jî rola sereke dibîne di hevokê de. Ango di hinek hevokan de raveber eger nehatibe bikaranîn, wê demê hevok wateyeke temam nade û guhdarvan yan jî xwîner dê ji vê hevokê fêm neke û nizanibe mebesta hevokê çi ye. Lewma ev mijar di mînaka jêrîn de wê zêdetir zelal bibe (kirasî spî ciwan e) di vê mînakê de peyva (spî) raveber e. Eger di vê hevokê de em peyva (spî) jê bibin wê demê wateya hevokê xera dibe û wateya temam nîşan nade. Di derbarê vê babetê de nivîskaran pênaseya ravebera dikin û dibêjin, (mebest ji sazûna hevoka diyaerxerê zelalkirina zêdetir û nasandina mebesta vê hevokê ye ku axêver tîne zimên, bi vî awayî hêzeke zêdetir dide hevokê), (Tallerman, M, 1998; 144). Ango peyva raveber ji bo vê yekê saz bûye, heta hêsantir û aşkeratir guhdarvan yan xwîner ji hevokê yan ji axaftinê fêm dike. Xwîner yan axêver dema li mijarekê guhdar dike yan jî mijarekê dixwînin ji bo ku mandî nebin bi lêgerîna wateyên di hevok û axaftinan de, her di çarçoveya vê mijarê de şarezayan û nivîskaran û lêkolanan dibêjin, (hevoka raveber ew hevok e ku tevî hevoka sereke dibe û sere girêya navî ya hevoka sereke dide nasîn), (Şilêr Resul Muhemed, 2002; 132). Ango dibe û diguncînit li gorî vê pênaseyaji du hevokan pêkhatibin diyarser van du hevokan ji hev cuda kiribin yan jî her du hevokan yek bin. Lê raveber ew cuda kiribe daku zelalkirina zêdetir bide guhdarvan û xwîneran, lê di vê derbarê de nivîskaran yan şarezayên zimanî û lêkolêrên din hene ku di bêtî, (merc nîne her hevokeke cuda bûyî, hevoka Raveber be), (Jiyan Ebduleh Muhemed, 2014; 33). Her wiha di çarçoveya vê mijarê de nivîskarek û lêkolerekî din dibêje, (Raveber anga zanyariya zelalkirina zêdetir di derbarê her amrazeke hevokê ya sêntakîsê de), (Rad Ford, rûpel, 1997; 25). Ango mebest ji zelalkirina amraza hevokê ya sentaksê ji bo vê yekê ye daku guhdarvan û xwîneran bi hêsanî ji mijarê fêm bikin û ji bo fêmkirina mijarê jî zêde şiyana xwe xerc nekin. Her wiha daku mijar zêdetir zelal be û zêdetir aşkere be ji me re, di vê çarçoveyê de lêkolerekî din dibêje, (Raveber, ji her amrazeke weke morfîm, firêz û hevokê re dibêjin raveber ku ji bo erka zelalkirin û berfirehkirina amrazên hevokê tê bikar anîn di sentaksê de), (Ehmed Hesên, 2006; 45). Ango raveber radibe bi erka xwe ya akademîk û zoriya guhdarvan û xwîneran kêr dike daku şiyana zêdetir xerc nekin bi lêgerînê li pey wateyan di hevokê yan

jîamrazeke din a zimanê Kurdî de. Ango raveber hene di hevokê, li berê sere û piştê sere, asta morfolojî û asta sentaksê de ku erka wan zelalkirin û berfirehkirin e, di hevokên jêrîn de dê zêdetir werin zelalkirin.

Westa Şêrzad. (westa Raveber e).

Mamosta Leyla. (mamosta Raveber e).

Doktor Qasim. (doktor Raveber e).

Qasimî Qutabî. (qutabî Raveber e).

Azadî doktor. (doktor Raveber e).

Polîxwêndin pak e. (xwêndin Raveber e).

Wan ke be gullî wan, ciwan e. (ke be gullî wan Raveber e).

Mirov ke be xwêndin, ciwan e. (ke be xwêndin Raveber e).

Kiçekey mamosta zîrek e. (mamosta Raveber e).

Kurekey Şîlan hat. (şîlan Raveber e).

3.2.1.Nasrav

Peyveke yan amrazeke yan diyardeyeke yan jî pêkhateyeke ku xelk wê nas dikin, lê merc nîne yan şert nîne ev nasîn giştî be, dibe di çarçoveyeke diyarkirî jî de be. Weke mînak dema ez di nava polê de dibêjim, (bireyekem hat) tenê di çarçoveya polê de tê zanîn ku ev birayê min e. Ango bi awayekî giştî yan pîranî nayê zanîn ew kurik birayê min e, anga hemû medrese nizane ew birayê min e, belkî di çarçoveya diyarkirî de dibe ev nasandin yan jî naskirin e. Eger em pênaseya nasrav yan nenasrav bikin anga kirdeya zimanî ye û xuyakerê derxistin û eşkerekirinanavek yan amrazek yan jî pêkhateyeke. Her wiha di çarçoveya vê mijarê de şarezayan û lêkolanan wiha pênase kirine û dibêjin, (nasdar li gorî cudakirina xwediyê nav, berê wê guhdarvan û xwîneran dizanin), (Ebubekir Omer Qadir, 2003; 10). Anga nasdarê vê demê dibe nasdarê di navbera du kesan de û xwedî pêşîne be di navbera ew du kesan de anga derbarê wê de agahî hebin. Vêca evmorfeman bi rolên xwe radibin di nasdarkirinê de, weke di vîmînakê de tên zelalkirin, (birayekem hat), peyva (bira) hatiye nasandin ji guhdarvan re bi sedema morfema (eke)yê, bi vê sedemê ye ku

peyva (bira) bûye peyvekenasdar. Her wiha di çarçoveya vê mijarê de lêkoleran nêrinên xwe bi vî rengî anîne zimên, (nasdarî di zimanê Kurdî de bi rêya morfemabend û morfema serbixwe tê), (Lîmo Mehmud Tofîq, 2012; 14). Ango morfema serbixwe bi navê re nayê girêdan, lê morfema bend her wek ji navê wê xuya ye tê girêdandaku zelaltir û eşkeretir be. Hinek ji mînak, (em dildar e), peyva (em) di hevokê de ku peyva (dar)ê kiriye nasrav yan nasandin, morfema serbixwe ya nîşanî ye, morfemên taybet bi nasdarkirin di zarê Soranî de ev in, (ke, eke, e, yeke).

3.2.1.1. Morfema Nasrav (ke)

Morfema(eke) di zarê Soranî de bi awayekî giştî di sentaksê de rola nasandinê dibîne. Lê di heman demê de nayê wê wateyê ku morfema (eke)yê xwedî rolên din nîne di sentaksê de, belkî xwedî rolên dine jî, bo mînak, rola girêdana du hevokan dibîne, weke (deçête bazar ke ehmed hatewe). Her wiha di çarçoveya vê mijarê de lêkoleran xwedî gotinên xwe ne dibêjin, (morfema (ke) bi daçeka demê behs dike, ango morfema (ke) daçeka demê ye), (Seîd Sidiqî Kabanî, 1949; 2). Ango morfema (ke) dikare bibe sedema diyarkirina (dem)ê mînak, Deçête bazar ke bawkim hatewe. Di vê hevokê de (ke) bûye sedema diyarkirina demeke ku hê jî nediyar e. Lê ew dem e ku (bavê wî/wê vehatiye). Her wiha di çarçoveya vê mijarê de nivîskaran û lêkoleran ên sentaks di zarê Soranî de nêrin peyvên xwe yên taybet hene û dibêjin, (morfema (ke) daçeka gehandinê ye), (Kamil Hesên Besîr, 1983; 35). Ango morfema (ke) erka girêdanê ya durust dibîne û bi hev re girê dide, mînak, deçîne qutabxane ke mamosteyekan hatnewe. Di vê hevokê de em dibînin ku erka girêdan û gehandina du hevokan pesêj kiriye û em wiha dibînin ku morfema (ke) bi tenê bêtate ye. Lê roleke girîng dibîne di sentaks a zarê Soranî de, lê mebesta ku em dixwazin behs bikin ewe ku morfema (ke) rola (Raveber)ê bibîne û (ke) bibe raveber. Di vê mînaka jêrîn em ê mijarê zelaltir bikin daku agahiyên zêdetir bikeve destê me li ser mijarê, mînak, (Otombêleke hat). Morfema (ke) di vir de bûye raveber û rola ravebera dibîne. Her wiha (Turegeke bihênin) di vê hevokê de morfema (ke) rola ravebera dibîne ku bûye ravebera peyva (turege). Her wiha di hevoka (mamostayeke hat) morfema (ke) bûye ravebera peyva (mamosta).

3.2.1.2. Morfema Nenasravîya (eke)

Ev jî morfemeke ji wan morfemên ku çendîn rol dibîne di sentaksa zarê Soranî de, ango di kêleka nasandinê de rola ravebera dibîne, morfema (eke)yê ligel navê giştî yan jî taybet tê bikaranîn. Her wiha di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin, (morfema (eke)yê rol û erka nasdarkirina navê giştî û jimardar dibîne), (Fattah, M, M, 1999; 40). Ango mebesta nivîskaran û lêkolanan di derbarê jimardarê de eve ku amraz yan jî pêkhatayê ku morfema (eke)yê çûye ser û kiriye nasdara ku tê jimartin. Mînak, Qutabiyeke. Di vir de em dikarin qutabî bijimêrin ku yek qutabî ye, lê em di vê mijarê de bala xwe didin ser mijara sereke ku 'Raveber'e ango ji me re diyar dibe ku morfema (eke)yê rola ravebera dibîne di zarê Soranî de, ji bo berçav ronî û agahiyên zêdetir di derbarê vê mijarê de em ê çend mînakên din binivîsin.

- | | |
|--------------------|---|
| Kiçeke hat. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (kiç)ê. |
| Kureke naxewêt. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (kur)ê. |
| Guleke ciwan e. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (gul)ê. |
| Rûbareke ciwan e. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (rûbar)ê. |
| Hespeke hat. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (hesp)ê. |
| Jineke mird. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (jin)ê. |
| Qelemeke nanûsê. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (qelem)ê. |
| Kitêbeke bizir bû. | Di vê hevokê de (eke) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê. |

3.2.1.3. Morfema Nasrava (yeke)

Yê ev jî morfîmeke ji wan morfîmên ku rola nasravî dibîne yan jî werdigire di sentaks a zarê Soranî de, her wiha serbarê morfema (eke)yê ya nasdariyê, rola ravebera jî dibîne û werdigire, nivîskaran û lêkolanan di vê mijarê de nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin, (ev morfîm hatiye girêdan bi dawiya peyva navê), (Vyan Silêman Berzicî, 2001; 12). Ango ev morfem jî diçe ser navê ku bi dawiya morfemê hatiye girêdan, lê ev morfemê naçe ser her navekî, belkî nav bixwe dibe bi tîpa 'î' bidawî hatibe, ya ku girîng e li vir em ê amaje pê bidin û behs bikin raveber e, ango

ev morfem erka ravebera dibîne û dibe raveber, ji bo mijar zêdetir eşkera û hêsan bibe em ê çend mînakên berbehs bikin.

Masiyeke mird. Di vê hevokê de (yeke) bûye Ravebera peyva (masî)yê.

Kursiyeke şika. Di vê hevokê de (yeke) bûye Ravebera peyva (kursî)yê.

Diyariyeke ciwan e. Di vê hevokê de (yeke) bûye Ravebera peyva (diyarî)yê.

Qutabiyeke hat. Di vê hevokê de (yeke) bûye Ravebera peyva (qutabî)

yê.

Her wiha morfema (yeke) di hinek deman de diçe ser hinek navan ku dawiya wêbi tîpa (î) nehatiye, weke ev mînakên jêrîn. Dergayeke kirayewe, di vê hevokê de (yeke) bûye Ravebera peyva (derga)yê.

3.2.1.4. Morfema Nasravîya (e)yê

Ev jî morfemeke ji wan morfemên nasrav kirin di zarê Soranî de, di kêleka vê morfema ku erka nasdarîkirinê dibîne yan jî erka nasdarîkirinê werdigire û bi erka ravebera jî radibe. Her wiha roleke girîng dibîne di sentaksa zarê Soranî de. Di vê mijarê de nivîskaran û lêkolanan nêrinên xwe anîne zimên û dibêjin: (morfema nasdarî ya (e)yê kêmtir ji morfemên din ên nasravî yê derdikeve), (Şêrwan Hesên Samed, 2014; 144). Ango ev morfema (e)yê bi qasî morfemên din nayê bikaranîn di hevokê de yan jî bi wateyekê din, ew qasî ji bo nasdarîkirinê nayê bikaranîn. Ango naçe ser her nav û hevokekê, lê di vir de ya girîng ew e ku em amaje pê bikin û behs bikin ewe ku morfema (e)yê dibe raveber, daku zêdetir ji me re zelal û eşkere bibe, em ê li van mînakên jêrîn binêrin.

Kure danîşe. Di vê hevokê de (e) bûye Ravebera peyva (kur)ê.

Kiçe mêrdî kird. Di vê hevokê de (e) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.

Jine hat. Di vê hevokê de (e) bûye Ravebera peyva (jin)ê.

3.2.2. Nenasrav–Nenasraw

Dema ku behsa mijarekê tê kirin û gengeşe li ser wê tê kirin, di navbera wan gengeşeyan de hinek peyv yan jî hinek amraz tên behskirin ku axêver, xwîner,

guhdarvan û nivîskar jî bi wan nizanin û ew amraz yan jî mijarê nasnakin. Bêguman ji bo ku ji aliyê sentaksê ev mijar û amraz werin nenasrav kirin, di zarê Soranî de hinek morfemên bikaranîn. Di derbarê vê yekê de jî nivîskaran û lêkolanan nêrînên xwe anîne zîmnên û dibêjin, (Nenasrav angû veşartina nav di nava komek nav yan jî komek rengdêran (hevalnav) de, morfemên nenasrav bi nav yan jî rengdêran re tên girêdan), (Ebdulrehamn Hacî Marif, 2003; 79). Angû ji bilî ku morfema nasravnavan dike nenasrav. Bi heman awayî jî rengdêr jî nasravan dike nenasrav ya rengdêrî, daku ev mijar zêdetir zelal û eşkere bibe, em ê li van mînakên jêrîn binêrin.

Kur+êk = kurêk.

Kiç+êk = kiçêk.

Kar+êk = karêk.

Mal+êk = karêk.

Spî+yek = spîyek.

Mindal+ek = mindalek.

Piyaw+ek = piyawek.

Her wiha morfema nenasravjî aliyê nivîskaran û lêkolanan ve hatiye berbehskirin û wan di derbarê mijarê de nêrînên xwe anîne zîmnên û dibêjin, (morfema nenasrav heta radeyekê cih naguhêre anku çesp e), (Muhemed Mehwî, 2011; 99). Angû dema morfema nenasrav diçe ser nav yan jî peyvekê, eger nav di nava hevokê de were bikaranîn, wê demê bi awayekî giştî cih naguhêre anku çesp e. Lê di nava morfemên nenasrav de hinek morfem hene ku zêdetir tên bikaranîn û zêdetir çalakî ji morfemên din ên nenasdariyê. Her wiha di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan nêrînên xwe anîne zîmnên û dibêjin (morfema nenasdar ya (êk)ê ji hemûyan çalakî e û tê bikaranîn), (K. K. Kurdoef, 1984; 26). Angû morfema (êk)ê li hember morfemên din zêdetir tê bikaranîn di nenasravkirinê de. Her wiha di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan nêrînên xwe anîne zîmnên û dibêjin (morfema (yek) a nenasdar di pêlê duyemîn tê ji aliyê bikaranînê ve, bi taybetî ligel peyvekê tê bikaranîn ku dawîya wê bi tîpa (î) yê hatibe), (Kewser Ezîz Muhemed, 1990; 83). Angû Morfema (yek)ê li hember morfemên din di nenasravkirinê de, tenê yan jî zêdetir ligel van nava tên bikaranîn ku dawîya wê bi tîpa (î) yê hatibe.

Mînak

Masî+yek = masîyek.

Spî+yek = spîyek.

Her wiha di çarçoveya vê mijarê de morfema nenasrav ya (ê)yê weke morfemeke aborîkirin tê nasîn, lewma jî nivîskaran û lêkolanan dibêjin (morfemanenasrav ya (ê)yê weke morfemeke aborîkirin tê nasîn), (Şêrwan Husên Ehmed, 2014; 88). Ango ev morfem lewma weke morfemeke aborîkirin tê nasîn ji ber ku wize û enerjîyeke kêmtir tê xerckirin di nivîsandin û gotinê de, di vir de ji bo ku zêdetir mijar zelal û eşkere bibe, em ê di mînakên jêrîn de berbehs bikin.

Mînak

Piyaw+ê = piyawê.

Jin+ê = jinê.

Mal+ê = male.

Mer+ê = mere.

Ciwan+ê = ciwanê.

Dirext+ê = dirextê.

Lê ya ku di vir de girîng e û em ê berbehs bikin, ev morfemên nenasraviyê dibin raveber û erka ravebera werdigirin di sentaks a zarê Soranî de, lewma em jî di mînakên jêrîn de amaje pê dikin ji xwîneran re.

3.2.2.1. Morfema Nenasrav ya (êk)

Ev morfem weke çalaktirîn morfem tê nasîn ku me berê jî behs kir û ev morfem ji bilî rola nenasravkirinê, rola ravebera jî dibîne bi taybetî di sentanks a zarê Soranî de. Ji bo kumijar baş û bedew were fêmkirin, di bin sîya van mînakên jêrîn de ji guhdarvan û xwîneran re em ê mijar hêsantir bikin.

Mînak

Kurêk hat.

Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (kur) ê.

Malêk suta.

Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Minadalêk hat.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (mindal) ê.
Kerêk topî.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (ker) ê.
Xuşkêk nehat.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (xuşk) ê.
Gulêk bikire.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (gul) ê.
Dukanêk bikire.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (dukan) ê.
Poşakêk wergire.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (poşak) ê.
Darêk riwa.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (dar) ê.
Pertûkêk bizir bû.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (pertûk) ê.
Qelemêk şika.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (qelem) ê.
Gulêk wişk bû.	Di vê hevokê de (êk) bûye Ravebera peyva (gul)ê.

3.2.2.2. Morfema Nenasrav ya (ek)yê

Ev morfema nenasraviyê jî roleke girîng dibîne di zarê Soranî de, ji bo nenasravîkirinê ev morfem jî bi tenê rola nenasraviyê nabîne, belkî di sentaksê de rola ravebera jî dibîne û werdigire. Ji bo ku li bal guhdarvan û xwîneran jî zelaltir û eşkeretir be, di çarçoveya mijara ravebera de em ê vê mijarê berbehs dikin da ku rola vê morfema Rravebera were dîtîn ku çawa morfema (ek)ê rola ravebera werdigire di zarê Soranî de.

Mînak

Piyawek hat.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.
Gulek şika.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (gul)ê.
Kiçek çû.	Di vê hevokê de (ek) bûye Raveberapeyva (kiç)ê.
Pertûkek wergire.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (pertûk)ê.
Poşakek bikire.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (poşak)ê
Gulek wergire.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (gul)ê.
Jinek girya.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Şêrek nerî.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (şêr)ê.

Hespek bizir bû.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.
Kerek diyar nema.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (ker)ê.
Mindalek pêkenî.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (mindal)ê.
Qelemek şika.	Di vê hevokê de (ek) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

3.2.2.3. Morfema Nenasrav ya (yek)ê

Ev morfema nenasraviyê ji piraniya morfemên din cudatir e, bi awayekî ku ji bilî morfemeke çalak e û roldar e di mijara nenasraviyê de, çawa ku berê me behs kiribû, lê ya ku girîng e di vê mijarê de morfema (yek)ê erka ravebera jî werdigire di zarê Soranî de. Bi awayekî ku hêjaye behskirinê ye, ev morfema kuerkaravebera jî dibîne yan jî werdigire di sentaks a zarê Soranî de, lê bi awayekî giştî ligel van peyvan jî tê bikaranîn bi mercek ku peyv bi tîpa (î) bi dawî hatibe. Ji bo ev mijar li bal me eşkeretir û hêsantir be, bi mînakên zanistî em ê berbehs dikin. Her wiha di çarçoveya vê mijarê demorfema (yek)ê nenasraviyê erka ravebera werdigire ku ev jî mijara me ye, ji bo ku zêdetir ji guhdarvan û xwîneran re bidin nasandin, çend mînakên tînin berbehsan ku berê jî me bi pênaseyên nivîskaran û lêkolanan amaje pê kiribû. Lê ya ku di vira de mebesta me ye, em dixwazin bi nimûneyên zelal nîşan bidin ku morfema nenasraviya (yek)ê çawa rola ravebera werdigire.

Mînak

Masîyek bixor. Di vê hevokê de (yek) bûye Ravebera peyva (masî)yê.

Kursîyek suta. Di vê hevokê de (yek) bûye Raveberapeyva (kursî)yê.

Şûtîyek bikire. Di vê hevokê de (yek) bûye Ravebera peyva (şûtî)yê.

Tûtîyek hat. Di vê hevokê de (yek) bûye Ravebera peyva (tûtî)yê.

Her wiha di vir de em dixwazin amaje bi tiştekî girîng bikin ku morfema nenasraviyê di zarê Soranî de ligel hinek peyvan tê bikaranîn û wan dike nenasrav û erka ravebera werdigire, lê dawiya hevokê bi (î)yê nehatiye, belkî bi 'o'yê dawî hatiye, her weke di van mînakên jêrîn de hatiye.

Mînak

Pero+yek = peroyek

Peroyek bihêne, di vê hevokê de (yek) bûye Ravebera peyva (pero)yê.

3.2.2.4.Morfema Nenasrav ya (ê)

Serbarê çalakbûna vê morfemê di erka nenasraviyê de ye, erka ravebera jî werdigire, lê berî ku em biçin ser mijara ravebera divê were diyarkirin ku ev morfem erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Her wiha em ê amaje bi tiştê bikin ku ev morfema ha rola hêskariyê dibîne di nivîsandin û axaftinê de da ku kêmtir wize û enerjîyan xerc bibe. Lewma di çarçovaya vê mijarê de emê amaje bi mijara sereke ya xwe dikin ku mijara ravebera ye, ango evmorfema (ê) yê erka ravebera werdigire û dibe ravebera peyva berî xwe yan ew peyva ku pêre hatiye girêdan yan jî girêdayî vê morfemê ye. Ji bo ku li bal guhdarvan û xwîneran zelaltir û eşkeretir bibe û em bibînin çawa morfema (ê) yê dibe raveber emê çend mînakên bînin berbeşê.

Mînak

Piyawê hat.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.
Jinê hat.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Ciwanê royişt.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (ciwan)ê.
Merê bigire.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (mer)ê.
Jinê bihêne.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Jinê bixwaze.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Otombêlê wergire.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (otombêl)ê.
Gulê biçêne.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (gul)ê.
Cilê bidûre.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (cil)ê.
Hespê çû.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva(hesp)ê.
Nanê bixo.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (nan)ê.
Kerê topî.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (ker)ê.
Momê dagîrsêne.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (mom)ê.
Sêwê bixo.	Di vê hevokê de (ê) bûye Ravebera peyva (sêw)ê.

Bi rêya van nimûneyan ji me re xuya dibe kumorfema (ê)yê rolaravebera dibîne. Her wiha roldar bûye di kêr xerckirina wize û enerjiyan jî ji nivîskaran û xwîneran re bi şêwazekê zanistî.

3.2.3. Morfema Kom ê

Ev morfemên ha di zarê Soranî de rola komkirinê dibîne, angê peyvan jî yekjimariyê dikin pirjimar, ev morfemên ku diçinê ser navekî yekjimar, angê bi şêwazekê zanistî navên yekjimar giştî dikin navê koma giştî, yan navê yekjimar dikin navê pirjimar. Her wiha di çarçoveya vê mijarê de nivîskaran û lêkolêrên xwedî nêrîn û peyvên xwe ne di derbarê morfema komê ya zarê Soranî de. Her wiha di derbarê vê mijarê de em diçin xizmeta nêrîn û peyvên nivîskaran û lêkolêrên, ew di çarçoveya vê mijarê de dibêjin, (morfema komê bi awayekî giştî pêk tê ji van (an, at, ekan) morfeman diçine ser navekî giştî ya yekjimar û wê dike yekjimar an jî kom), (Babê Resul Nûrî, 2012; 94). Angê mebesta wê lêkolêrê ne ew e ku tenê ev morfem hene ji bo komkirinê di zarê Soranî de belkî wiha dibîne van morfeman bi awayekî giştî diçine ser nav wan dike kom. Ji ber ku ev morfem çalak in. Ji bo ku ev mijar jî guhdarvan û xwîneran re zelaltir û eşkeretir bibe yan jî agahiyên zêdetir li ser wê bizanibin, em ê hinek mînakên berbehs bikin.

Mînak

Kur+ekan = kurekan.

Kiç+ekan = kiçekan.

Bax+at = baxat.

Mal+at = malat.

Kur+an = kuran.

Kiç+an = kiçan.

Her wiha di çarçoveya vê mijarê de, navê kom van nav yan jî van amraz yan jî kesan in ku ji yek dane zêdetir bin. Lewma daku ji me re zêdetir zelal û eşkere bibe emê biçin bal nivîskaran û lêkolêrên, bêguman ew xwedî nêrîn û peyvên xwe ne di derbarê vê mijarê de û dibêjin, (navêkom ji wan nava re tê gotin ku komek kes in yan jî komek tişt in ku ji du kes yan du tişt zêdetir bin), (Eurehamn Hacı Marif, 1979;

58).Ango li gorî vî pênasayê ku dibêje: wê demê jê re dibêjin kom ku ji du kes yan jî du tiştan zêdetir bin.Lê em wiha dibînin ku her tiştek yan her navek yan jî her amrazek ku ji yek dane zêdetir be wê demê jê re dibêjin kom. Ji ber ku nîşaneyê komê werdigerin yan jî morfema komê werdigerin, lewma her navek yan amrazek yan jî her tiştek ku ji yek dane zêdetir be wê demê jê re dibêjin kom. Lê di vir de morfemên komkirinê hene ku ji hinek morfemên din ên komkirinê çalakir in, ango ji komkirinê zêdetir roldar in di zarê Soranî de. Lewma her di vê çarçoveyê de em diçin bal nivîskaran û lêkoleran daku em bizanin wan çi dibêjin di drbarê vê mijarê de, bêguman ew di mijara hinek morfeman ku ji hinek morfemên din çalakir in, xwedî nêrin û peyvên xwe ne û dibêjin, (Morfema komkirina (an)ê ji aliyê komkirinê ve weke morfema sereke tê dîtin, ji ber ku ligel piraniya peyvan tê bikaranîn ku dawîya wan bi tîpên bêdeng yan jî tîpa (e)yê dengdar hatiye), (Zerê Yusif, 2005; 47). Ango li gorî vê çavkaniyê morfema (an)ê yek ji çalakirîn morfem e ji bo komkirinê. Ji bo ku ev mijar zêdetir were zelalkirin û şîkarkirinê, çend dane ji şêwaza (an)ê di mînakên de tînin bikaranîn daku li bal guhdarvan û xwîneran jîzêdetir zelal û aşîna bibe.

Mînak

Jin+an = jinan.

Piyaw+an = piyawan.

Kiç+an = kiçan.

Kur+an = kuran.

Şar+an = şaran.

Mirîşk+an = mirîşkan.

Keleşêr+an = keleşêran.

Dayik+an = dayikan.

Li vir ji mere xuya dibe ku morfema (an) ê morfemeke pir çalak e, li vir me tenê çend mînak nivîsand û me bi hûrî û kûrî behs nekir, ji ber ku paşê em ê di mijara ravebera de bi hûr û kûrî berbehs dikin ku ev morfem dibine raveber di zarê Soranî de. Her wiha em dewam dikin li ser vê babete bi awayekî zanistî em yek biyek behsa van morfeman dikin ku erka raveber dibîne bi awayekî zanistî. Her wiha li vir behsa

morfemeke din dîkin, ew jî morfema (yan) ku roleka girîng dibîne di komkirina diçe ser navan. Morfema (yan)ê ev morfem jî rola komkirinê dibîne di zarê Soranî de. Her wiha ji bo ku em berdewam bin li ser vê mijarê, bi awayekî zanistî van morfeman yek bi yek didin nasandin û paşê tînin berbehsê ku çawa erka ravebera werdigirin bi awayekî zanistî. Em niha behsa morfemeke din dîkin ku roldar e di komkirinê de û diçe ser navan, navên yekjimar dike navê pirjimar ku ew jî morfeman (yan) e. Lewma di çarçoveya vê mijarê de daku agahiyên me zêdetir li ser hebin, diçin bal nivîskaran û lêkolanan, bêguman wan jî nêrin û peyvên xwe hene li ser morfeman (yan)ê û dibêjin, (morfema (an)ê hinek caran tîpa (y) pêve tê girêdan û dibe (yan), ev jî di çend barekî de wiha dibe ku dawîya peyvê tîpên (î-a,o,ê) be), (Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, 1967; 125). Ango di zarê Soranî de her wext morfema (yan) nayê bikaranîn, belkî wê demê tê bikaranîn ku nav bi tîpên (î,a,o,ê) dawî hatibe, ji bo vê yekê û ji bo agahiyên zêdetir em ê çend mînakên binivîsin.

Mînak

Tirê+yan = tirêyan.

Masî+yan = masîyan.

Kurdî+yan = kursîyan.

Hermê+yan = hermêyan.

Bira+yan = birayan.

Pero+yan = peroyan.

Zana+yan = zanayan.

Di vir de ji me re xuya dibe ku ev morfem morfemeke ne pir çalak e, anga tenê di çend barekî de tê bikaranîn. Weke wan mînakên ku me behs kir, her wiha di çarçoveya vê mijarê de em berê xwe didin nivîskaran û lêkolanan ka nêrin û peyvên wan çi ne û çi dibêjin daku agahiyên zêdetir bikeve destê me, bêguman nivîskaran û lêkolanan nêrin û peyvên xwe hene û dibêjin, (peyva (mêgel)ê peyveke kom e amaje bi komê dike ku ew jî ligel navê giyandaran tê bikaranîn), (Bebe Resul Nurfî, 2012; 90). Ango peyva (gel)ê ligel giyandaran û her wiha mirov û bêgiyanan jî tê bikaranîn weke ji bo mirov (kurgel, kiçgel, xizmgel) û ji bo bêgiyanan jî (keştîgel, estîregel) tê bikaranîn. Her wiha morfemeke din ji bo komkirinê heye di zarê Soranî de, ev

morfem rola komkirinê dibîne. Morfema (eha)ê ev morfem jî yek ji wan morfeman e ku rola komkirinê dibîne di zarê Soranî de. Ev morfem erka komkirinê werdigire û paşê em behsa erka ravebera jî dikin di zarê Soranî de. Di çarçoveya vê mijarê denivîskaran û lêkolanan wiha nêrin û hizrên xwe tînin zimên û dibêjin: (morfema (eha)ê yek ji wan morfeman e ku erka komkirinê werdigire û bi taybetî ji bo hejmarê tê bikaranîn), (Ebdulrehman Hacî Marif, rûpel, 1979; 203). Ango ev morfem taybet e bi komkirina hejmarê, lewma ji bo zelalkirin û şîroveyênzêdetir em ê hinek mînak li jêr binivîsin.

Mînak

Sed+eha = sedeha.

Şew+eha = şeweha.

Roj+eha = rojeha.

Her wiha di derbarê tevahiya morfeman de di komkirinê de bi awayekî giştî cih naguher in anku çesp in, di vir de nivîskaran û lêkolanan dibêjin: (morfema komkirinê cihê xwe ya naguher û çespîn heye), (Ebubekir Omer Qadir, rûpel, 2003; 38). Lêbelê di her barekî de cih naguher in û çesp in, lê di hemû waran de em nikarin bêjin bi giştî cih naguher in û çesp in di zar û zimên de. Tiştê girîng ya ku em ê behs bikin morfemên komkirinê ne ku çawa erka ravebera werdigirin. Her wekî li jor ve me behskir û pênasekir û mînak jî anîn ku yek bi yek em ê behs bikin ka çawa rola raveber dibîne.

3.2.3.1. Morfema (ekan)ê

Ev morfem yek ji wan morfeman e ku roleke pir girîng dibîne di komkirinê de weke berê jî me amaje pê kir, lê mijara ku em li vir dixwazin behs bikin morfema (ekan) e ku erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Ji bo ku ev mijar zelaltir bibe di jêr de em ê çend mînak binivîsin.

Mînak:

Şarekan aw birdî. Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva(şar)ê.

Kiçekan hatin. Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.

Jinekan çûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Kurekan çûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Salekan xoş bûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (sal)ê.
Merekan nexos bûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (mer)ê.
Hespekan çust bûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.
Şêrekan derçûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (şêr)ê.
Mîwekan rizî bûn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (mîwe) yê.
Qazekan firîn.	Di vê hevokê de (ekan) bûye Ravebera peyva (qaz)ê.

3.2.3.2. Morfema (an)ê

Ev morfem jî yekê din e ji morfemên komkirinê ku weke çalaktirîn morfema komkirinê tê zanîn, lê mijara ku em dixwazin berbehs bikin morfema (an) e ku erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Ji bo ku bi awayekî zanistî vê yekê biselmînin, em ê çend mînakên ku morfema (an) ê erka ravebera werdigire li jêr dinivîsin.

Mînak

Kiçan hatin.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.
Şaran geram.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (şar)ê.
Şekir mexon.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (şekir)ê.
Dayika dilo van in.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (dayik)ê.
Keleşêran bang dêran.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (keleşêr)ê.
Kuran werin.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Piyawan neçûn.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.
Meran medoşin.	Di vê hevokê de (an) bûye Ravebera peyva (mer)ê.

3.2.3.3. Morfema (yan)ê

Ev morfem jî yek ji wan morfemên komkirinê ye ku em li vir dixwazin behsa morfema (yan)ê bikin ku erka diyarkerê dibîne di zarê Soranî de, ji bo vê mijarê em ê çend mînakên li jêr binivîsin.

Mînak

Tirêyan bişo.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (tire)yê.
Masîyan bixon.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (masî)yê.
Kursîyan bihonin.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (kursî)yê.
Peroyan bidirênin.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (pero)yê.
Zanayan navdar in.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (zana)yê.
Birayan serkewtin.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

3.2.3.4. Morfema (at)ê

Ev morfem jî yek ji wan morfema komkirinê ye, weke berê jî me behs kir, lê ya ku girîn e em li vir amaje pê bikin morfema (at) ê ye ku erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Ji bo vê yekê jî di çarçoveya vê mijarê de em ê çend mînakên zanistî û zelal binivîsin daku mijar li bal nivîskaran û xwîneran hêsanîr be û şarezaya me di derbarê vê mijarê de zêdetir be.

Mînak

Baxat ciwan e.	Di vê hevokê de (at) bûye Ravebera peyva (bax)ê.
Malat girîng e.	Di vê hevokê de (at) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Di van hevokan de ji me re zelal dibe ku morfema (at) ê rola komkirinê dibîne û di heman demê de erka raveberajî werdigire.

3.2.3.5. Morfema (eha)yê

Ev morfem jî mîna morfemên din rola komkirinê dibîne, lê cudahiya vê morfemê ev e ku zêdetir di hejmarê de tê bikaranîn û van hejmaran jî dike kom. Her wiha ev morfem jî weke heman morfemên din erka ravebera werdigire di zarê Soranî

de. Ji bo ku vê mijarê zêdetir bînin berbehs û lêkolînê, em ê çend mînakên zanistî û zelal ji guhdarvan û xwînerên hêja re binivîsin.

Mînak

Saleha gerayin. Di vê hevokê de (eha) bûye Ravebera peyva (sal)ê.

Sedeha çû. Di vê hevokê de (eha) bûye Ravebera peyva (sed)ê.

Rojeha royiştin. Di vê hevokê de (eha) bûye Ravebera peyva (roj)ê.

Lewma di vir de ji me re diyar dibe ku morfema (eha) yê erka ravebera werdigire.

3.2.4.Morfema Nasrav û Komê

Ev morfemên ha ji du morfeman pêk tên (morfema nasravê, morfema komê). Ango her du morfeman bi hev re zagonekê pêktînin ku jêre dibêjin: (nasdara komê) ev morfem di zarê Soranî de xwedî roleke berbiçav û diyar e, ew jî pêk tê ji (eke + an). Lewma ew her du morfem jî saz dibin û morfema (ekan) saz dikin, di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin, (morfema kom a nasdarî, ji morfema (ekan) pêk tê), (Teha Rehîm Reşîd, 2015; 44). Ango ev morfem diçe ser navê yekjimar û weke navê giştî tê naskirin, her di vê mijarê de ji bo zêdetir zelalkirin morfîmê bi awayekî zanistî ji guhdarvan û xwîneran re em ê hinek mînakên binivîsin.

Mînak

Kur + ekan = kurekan.

Kiç + ekan = kiçekan.

Jin + ekan = jinekan.

Piyaw + ekan = piyawekan.

Esip + ekan = espekan.

Şêr + ekan = şêrekan.

Sêw + ekan = sêwekan.

Henar + ekan = henarekan.

Kitab + ekan = kitabekan.

3.2.4.1.Morfema (ekan)ê

Ev morfema birîtiye di morfema kom û nasrav, di babetê pêşî me ev babet rave kir, her wiha me gotina vekoleran anî, lêbelê em ê di vê babetê de diyar bikin bê çawa rola raveber dibîne bi awayekî zanistî ji zarê Soranî de. Di jêr de em ê çend mînak binivîsn ji bo şirove kirina bi awayekî zelal ya vê mijarê.

Mînak

Kurekan hatin.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (kur)ê.
Kiçekan çûn.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (kiç)ê.
Jinekan mirdn.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (jin)ê.
Piyawekan birsîn.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (piyaw)ê.
Esipekan helatin.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (esip)ê.
Şêrekan azan.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (şêr)ê.
Sêwekan ciwanin.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (sêw)ê.
Henareka tirşe.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (henar)ê.
Qelemekan şika.	Di ev hevoke (ekan) raveber e ji bo peyva (qelem)ê.
Kitabekan bizirbun.	Di ev hevoke (ekan) ravebera jibo peyva (kitab)ê.

3.2.5.Morfema Nenasraviyê û Komê

Ev morfem jî ji du morfeman pêk tê, (morfeman nenasraviyê, morfema komê). Ango her du morfem bi hev re morfemeke nû pêk tînin û jêre dibêjin: (morfema koma nenasraviyê yan nenasraviya komê). Di çarçoveya vê mijarê de nivîskaran û xwîneran nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin: (ev morfem pêk tê ji morfema koma (an)ê ligel morfema nasrav (êk)ê û her du morfem jî zagoneke nû saz dikin), (Teha Rehîm Reşîd, 2015; 44).Ev zagon saz dibe di navbera morfema koma (an)ê û morfema (êk)a nenasraviyêde, evmorfem diçine ser navan û her wiha diçine ser hejmaran jî û wan ji yekjimarîyê dikine koma nenasraviyê. Di vir de em

êbi awayekî zanistî çend mînakên binivîsin ku çawa ev morfem erka ravebera jî werdigire di zarê Soranî de.

Mînak

Roj+an+êk = rojanêk.

Sal+an+êk = salanêk.

Mirov+an+êk = mirovanêk.

Kur+an+êk = kuranêk.

Kiç+an+êk = kiçanêk.

Piyaw+an+êk = piyawanêk.

Jin+an+êk = jinanêk.

Hesp+an+êk = hespanêk.

Kirtêb+an+êk = kirtêbanêk.

Her wiha hinek caran peyv ligel morfema (an)ê tê guhertin ji bo morfema (at)ê, weke mînakên li jêrîn.

Mînak

Bax+at = baxat.

Mal+at = malat.

3.3.5.1. Morfemên (an+êk, at+êk)

Ji van morfeman re dibêjin: (morfema nenasrav ya komê, morfema koma nenasraviyê), berê jî me behs kiribû û mînak jî nivîsandibû. Lêbelê di vir de ya pir girîng ew morfem in zarê Soranî de ku erka ravebera werdigirin. Lewma di jêrîn de em ê çend mînakên binivîsin ku di hevokê de bi awayekî giştî ev morfem erka ravebera werdigirin.

Mînak

Rojanêk nehat.

Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (roj)ê.

Salanêk çû.

Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (sal)ê

Kitêbanêk mehêne.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Şêranêk hatin.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (şêr)ê.
Kiçanêk hatin.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (kiç)ê
Kuranêk bizir in.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Piyawanêk mirov nîn.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.
Hespanêk mekire.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Raveberapeyva (hesp)ê.
Jinanêk mehêne.	Di vê hevokê de (anêk) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Baxatêk.	Di vê hevokê de (atêk) bûye Ravebera peyva (bax)ê.
Malatêk.	Di vê hevokê de (atêk) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

3.2.6. Morfema Xwedîtiyê (possessive)-Xawenyetî

Xwedîtî cureyeke morfemê ye ku ji komêk morfeman pêk tê ku erka xwedîtiyê werdigirin. morfema xwedîtiyê di çarçoveya firêz û hevokan de tên, weke morfemasentakî yan jî weke morfemasentaksa xwedîtiyê tên nasîn yan jê re dibêjin morfema sentaksa xwedîtiyê di zarê Soranî de. Ev morfem ji komêk cînavkên kesî pêk tên û jê re dibêjin, (morfema xwedîtiyê). Bêguman nivîskarên û lêkolanan nêrin û peyvên xwe hene û dibêjin, (morfîmên (m-man, t-tan, y-yan) weke morfemên cînavkan ên grupa xwedîtiyê tên nasîn), (Omêd Barzan Birzo, rûpel, 12010; 110). Ango ev morfem serbarê ku erka xwedantiyê werdigirin, her wiha erka ravebera jî werdigirin. Lê di vir de em bi awayekî zanistî tînin berbehs ku çawa erka ravebera werdigire di zarê Soranî de.

Mînak

Kur+im = kurim.

Kiç+im = kiçim.

Mamosta+m = mamostam.

Kur+man = kurman.

Kiç+man = kiçman.

Mamosta+man = mamostaman.

Dayik+it = dayikit.

Bawik+it = bawikit.

Mamosta+t = mamostat.

Dayik+tan = dayiktan.

Bawik+tan = bawiktan.

Mamosta+tan = mamostatan.

Mal+î-y = malî.

Pêlaw+î-y = pêlawî.

Kitêb+î-y = kirtêbî.

Mal+yan = malyan.

Pêlaw+yan = pêlawyan.

Kitêb+yan = kitêbyan.

Bi şêwazeke zanistî hatiye şîkarkirin ku di zarê Soranî de evmorfem yan jî ev cînavk erka xwedîtiyê (possessive) werdigirin. Lê ya girîng ewe ku evmorfem erka ravebera jî werdigirin. Em ê di vê çarçoveyê de mijara van morfeman yan jî van cînavkên girêbend bi awayekî zanistî şîkar bikin ku çawa erka ravebera werdigirin di zarê Soranî de.

3.2.6.1. Morfema (m)ê

Ev morfema yan jî ev cînavka her wekî berê me behs kir ku erka ravebera jî werdigire, ya ku girîng e li vir em amaje pê bidin morfema (m)ê ye ku çawa erka ravebera werdigire. Ji bo vê yekê nivîskaran û lêkolanan nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin: (morfîmên (m _ man, t _ tan, î-y _ yan) erka Ravebera werdigirin), (Omêd Berzan Birzo, 2010;111). Ango ev morfem yan jî ev cînavkan erka ravebera jî werdigirin. Ji bo vê mijarê em bi awayekî zanistî hemû ew morfem berbehs dikin ku çawa erka ravebera (m)ê werdigirin di zarê Soranî de.

Mînak

Mamostam hat. Di vê hevokê de (m) bûye Ravebera peyva (mamosta) yê.

Biram royîşt. Di vê hevokê de (m) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Pertûkim bizir bû. Di vê hevokê de (m) bûye Ravebera peyva (pertûk)ê.

Malim nîye. Di vê hevokê de (m) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Bawikim hat. Di vê hevokê de (m) bûye Ravebera peyva (bawik)ê.

3.2.6.2.Morfema (man)ê

Ev morfem yan jî ev cînavk yek ji wan morfeman e ku erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Her wiha ev cînavk jî jêre dibêjin cînavka komê. Di mînakên jêrîn de bi awayekî zanistî û zelal em vê mijarê berhehs dikin ku morfema (man) ê çawa erka ravebera werdigire.

Mînak

Mamostaman hat. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.

Biraman hat. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (bira)ê.

Pertûkman suta. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (pertûk)ê.

Bawikman hat. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (bawik)ê.

Hespmann kirî. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.

Malman heye. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Xuşkman hat. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (xuşk)ê.

Qelemman şika. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

Destman girt. Di vê hevokê de (man) bûye Ravebera peyva (dest)ê.

3.2.6.3. Morfema (t)ê

Ev morfem yan jî ev cînavk yek ji wan morfeman e ku erka ravebera werdigire di zarê Soranî de. Ango di kêleka ku erka xwedîtîyê werdigire, erka ravebera jî werdigire. Her di vê çarçoveyê de bi awayekî zanistî û zelal em ê vê mijarê di mînakên jêr de berbehs bikin ku çawa morfema (t) ê erka ravebera werdigire.

Mînak

Xwêndkarit hat. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (xwêndkar)ê

Mamostat hat. Di vê hevokê de (t) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê

Bawikit hat. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (bawik)ê.

Xuşkit nehat. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (xuşk)ê.

Qelemit şika. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

Hespit taw deye. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.

Malit nema. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Kirtêbit bihêne. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.

Kirasit bizir bû. Di vê hevokê de (it) bûye Ravebera peyva (kiras)ê.

3.2.6.4. Morfema (tan)ê

Ev morfem yan cînavk jî yek ji wan morfeman e ku li kêleka erka xwedîtîyê, erka morfemaravebera jî werdigire di zarê Soranî de. Di çarçoveya vê mijarê de bi awayekî zanistî û zelal em ê bi çend mînakên ji nivîskar û xwîneran re bînin berhehs ku çawa morfema (tan) ê erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Mamostatan çû. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (mam)ê.

Xaltan hat. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (xal)ê.

Biratan royîşt. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Xuşktan xewit. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (xuşk)ê.

Mamostatan nehat. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (mamosta)
yê.

Qelemtan şika. Di vê hevokê de (tan) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

3.2.6.5. Morfema (î-y)ê

Ev morfem yan cînavk jî yek ji wan morfeman e ku li kêleka erka xwedîtîyê, erka morfemaravebera jî werdigire di zarê Soranî de. Di çarçoveya vê mijarê de bi awayekî zanistî û zelal em ê bi çend mînakên ji nivîskar û xwîneran re bînin berhehs ku çawa morfema (î-y) ê erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Mamostaî çû. Di vê hevokê de (î) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.

Biraî royîşt. Di vê hevokê de (î) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Xuşkî nust. Di vê hevokê de (î) bûye Raveberapeyva (xuşk)ê.

Dayikî nexoşe. Di vê hevokê de (î) bûye Ravebera peyva (dayik)ê.

Malî heye. Di vê hevokê de (î) bûye Raveberapeyva (mal)ê.

Qelemî şika. Di vê hevokê de (î) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

Kitêbî nema. Di vê hevokê de (î) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.

3.2.6.6. Morfema (yan)ê

Ev morfem yan cînavk jî yek ji wan morfeman e ku li kêleka erka xwedîtîyê, erka morfemaravebera jî werdigire di zarê Soranî de. Di çarçoveya vê mijarê de bi awayekî zanistî û zelal em ê bi çend mînakên ji nivîskar û xwîneran re bînin berhehs ku çawa morfema (yan)ê erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Malyan heye. Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Birayan hat.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.
Mamostayan çû.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.
Kirtêbyan nehêna.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (kitêb)yê.
Mamyan royişt.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (mam)yê.
Qelemyan şika.	Di vê hevokê de (yan) bûye Ravebera peyva (qelem)yê.

3.2.7. Nasravû Xwedîtî (possessive)

Ev morfem pêk tê ji du morfeman (morfema nasraviyê û morfemaxwedîtîyê). Her du morfem hev digirin û morfemeke taybet saz dikin û jêre dibêjin morfema (nasrav + xwendîtîyê). Weke berê jî me behs kiribû morfemên nasraviyê pêk tên ji (eke, ke, yeke). Her wiha morfemên xwedantîyê jî pêk tên ji (m_ma, t_tan, î-y_yan), morfema (nasrava + xwedîtîyê), di zarê Soranî de erka ravebera jî werdigire. Ango di kêleka morfema nasraviyê û morfema xwedîtîyê, erka ravebera jî werdigire. Mijara girîng di vir de ewe ku em bi awayekî zanistî vê mijarê berbehs bikin ku çawa morfema (nasrav + xwedîtîyê), erka ravebera jî werdigire. Lewma di çarçoveya vê mijarê de em çend mînakên tînin berbehs û şîkariyekê zanistî û zelal dikin ku çawa ev morfema (nasraviya Ravebera) erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Kurekem hat.	Di vê hevokê de (ekem) bûye Ravebera peyva (kur)yê.
Kitêbekem bizir bû.	Di vê hevokê de (ekem) bûye Ravebera peyva (kitêb)yê.
Qelemekem şika.	Di vê hevokê de (ekem) bûye Ravebera peyva qelem)yê.
Kurekeman hat.	Di vê hevokê de (ekeman) bûye Ravebera peyva (kur)yê.
Kitêbekeman bizir bû.	Di vê hevokê de (ekeman) bûye Ravebera peyva (kitêb)yê.

Qelemekeman şika.	Di vê hevokê de (ekeman) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Kurekey hat.	Di vê hevokê de (ekey) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Kitêbekey bizir bû.	Di vê hevokê de (ekey) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Qelemekey şika.	Di vê hevokê de (ekey) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Kurekeyan hat.	Di vê hevokê de (ekeyan) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Kitêbekeyan bizir bû.	Di vê hevokê de (ekeyan) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Qelemekeyan şika.	Di vê hevokê de (ekeyan) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Kureket hat.	Di vê hevokê de (eket) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Kitêbeket bizir bû.	Di vê hevokê de (eket) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Qelemeket şika.	Di vê hevokê de (eket) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Kureketan hat.	Di vê hevokê de (eketan) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Kitêbeketan bizir bû.	Di vê hevokê de (eketan) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Qelemeketan şika.	Di vê hevokê de (eketan) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

3.2.7.1. Morfema Nenasravya Xwedîtiyê ya (yeke)+(m_man, t_tan, î-y_yan)

Li gorî van zagonên jorîn, li jêrîn çend mînakên şîkar dikin ku morfema (nasraviya xwedantiyê) erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Kursîyekem şika. Di vê hevokê de (yekem) bûye Ravebera peyva (kursî)yê

Birayekem hat. Di vê hevokê de (yekem) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Qutabîyekem kewt. Di vê hevokê de (yekem) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.

Kursîyekeman şika. Di vê hevokê de (yekeman) bûye Ravebera peyva (kursî)yê.

Birayekeman hat. Di vê hevokê de (yekeman) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Qutabîyekeman kewt. Di vê hevokê de (yekeman) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.

Kursîyekey şika. Di vê hevokê de (yekey) bûye Ravebera peyva (kursî)yê.

Birayekey hat. Di vê hevokê de (yekey) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Qutabîyekeyan kewt. Di vê hevokê de (yekeyan) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.

Kursîyekeyan şika. Di vê hevokê de (yekeyan) bûye Ravebera peyva (kursî)yê.

Mamostayket hat. Di vê hevokê de (yeket) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.

Qutabîyeket nehat. Di vê hevokê de (yeket) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.

Qutabîyeketan hat. Di vê hevokê de (yeketan) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.

3.2.7.2. Morfema Nasravya Xwedîtiyê ya (ke)+ (m_man, t_tan, î-y_yan)

Li gorî van zagonên jorîn, li jêrîn çend mînakan şîkar dikin ku morfema(nasravya xwedîtiyê) erka ravebera jî werdigire.

Mînak

Birakem hat. Di vê hevokê de (kem) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Birakeman hat. Di vê hevokê de (keman) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Birakey hat. Di vê hevokê de (key) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Birakeyan hat. Di vê hevokê de (keyan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Biraket hat. Di vê hevokê de (ket) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Biraketan hat. Di vê hevokê de (ketan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

3.2.8. Morfema Nasravya Komêya Xwedîtiyê

Ev morfem ji sê zagon yan jî sê morfeman pêk tê, her sê zagon yan jî morfem bi hev re morfemeke taybet saz dikin ku jêre dibêjin, (morfema nasrav ya komê ya xwedîtiyê). Lêbelê yê ku armanca me ye ewe ku vê morfemê erka ravebera jî werdigire di zarê Soranî de. Di çarçoveya vê mijarê de bi awayekî zanistî û zelal çend mînakan şîkar dikin li gorî zagona(yek, k, ek + an) + (m_man, t_tan, î-y_yan).

Mînak

Birakanim hat. Di vê hevokê de (kanim) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Birayekanim hatin. Di vê hevokê de (yekanim) bûye Ravebera peyva (bira)yê.

Kurekanim hatin.	Di vê hevokê de (ekanim) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Qutabyekanim kewtin.	Di vê hevokê de (yekanim) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.
Qutabiyekaniman kewtin.	Di vê hevokê de (yekaniman) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.
Kitêbekaniman neman.	Di vê hevokê de (ekaniman) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Qutabyekanî hatin.	Di vê hevokê de (yekanî) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.
Birayekanî hatin.	Di vê hevokê de (yekanî) bûye Ravebera peyva (bira)yê.
Qutabîyekanyan kewtn.	Di vê hevokê de (yekanyan) bûye Ravebera peyva (qutabî)yê.
Birayekanyan hatin.	Di vê hevokê de (yekanyan) bûye Ravebera peyva (bira)yê.
Mamostakanit hatin.	Di vê hevokê de (kanit) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.
Xuşkekanit hatin.	Di vê hevokê de (ekanit) bûye Ravebera peyva (xuşk)ê.
Hespekantan çûn.	Di vê hevokê de (ekantan) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.

Di van şîkar û şîroveyan di zarê Soranî de ji me re xuya û zelal dibe ku morfema (nasrav ya komê ya xwedîtîyê) ku sê morfem in û her sê morfeman jî dibin raveber di hevokê.

3.3.Ronana Derveyê Firêza Navî

Firêz di zimanê Kurdî de xêncî bêjeya firêzê, di nava lêkoleran de çendîn bêjeyên din jî bikar tînin li hemberê peyva firêzê ku tê wateya heman peyva firêzê ku

wan jî (girê, kurtîle hevok). Her di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan behsa firêz kirine û li ser vî nivîsandine û dibêjin, (firêz pêkhateyekê girîng e peyvsaziyê ye, her amrazekê jî di asta zimên de bi astên din ên zimên ve peyvenddar in), (Fatt, M, M, 1999; 188). Ango di nava zimên de hemû amrazên ziman bi hev re peyvendîdar in û bi hev re hatine girêdan, her di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan nêrin û peyvên din jî hene ku dibêjin: (firêz komek peyvên peyvenddar in bi hev re û kar pêre nîne), (Tewfîq Wehbî, 1929; 62). Ango firêz tenê ji peyvekê sade pêk nayê, belkî êzdetir ji peyvekê pêk tê, lê bi karê peyvenddar nîne û pêre nayê. Her wiha nivîskar û lêkolerekî din li ser heman mijar bi awayekî din pênasîya firêzê dike û bi şêwazekê zanistî nêrin û peyva xwe tîne zimên û dibêje (firêz komek peyvên bi hev re girêdayî ne û ji hev necuda ne ku wateya temam nadin, kar nîne di firêz û hevokê de jî, belkî erka axaftinê werdigire), (Nurî Elî Kerîm, 1960; 29). Ango firêz ji çend tîpekê pêk tê ku hemûyan bi hev re peyvenddar in. Lêbelê tenê be wateyekê baş û durust nade, her di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan bi awayên zanistî di derbarê (firêz)ê de nêrin û peyvên xwe tînin zimên û dibêjin (firêz ji peyvekê yanê zêdetir ji peyvekê pêk tê), (Wirya Omer Emîn, 2004; 148). Ango firêz ji peyvekê sade saz nabe, belkî ji peyvekê zêdetir be û tenê nikare wateyê hevokê saz bike. Lewma pêwîstiya wê bi amrazên din di nava hevokê de heye hinek ji lêkolanan wiha dibêjin ku ti pêvandiya firêzê bi karê re nîne. Belkî amrazên firêzê bi hev re peyvendar in, her di vê mijarê de nivîskaran û lêkolanan derbarê (firêzê) bi awayekî din nêrin û peyvên xwe tînin zimên û dibêjin: (firêz xwedî taybetmendiyekekê xwe ye ku tê kurtkirin jib o peyvekê), (Eurehamn Hacî Marif, 2004; 265). Ango di dawîya van pênasîyan me fêhm kir ku firêz ji du peyvan yan jî zêdetir pêk tê û peywendîya wê bi karê re nîne. Her wiha wateyê temam jî nade, lewma di mijarên din ên paşîn de em behsa firêz û ravebera dîkin û şîkara wê dîkin ku çawa erka ravebera werdigire. Her wiha şarezayên ziman li ser vê baweriyê ne ku (curên firêzê li gorî teoriyan hatine berhevanîn û guhestin, li gorî teoriya kategoriya cureyên firêzê tên diyarkirin), (Hatem Wirya Hemed, 2006; 53). Ango di vê mijarê de dabeşkirina ew du teoriyan agahiyekê biçûk e ji xwîneran re, anga em behsa teoriya kategoriya, berhevanîn û guhestinê nakin. Anga em di vê mijarê de bala xwe didin ser ravebera.

3.4.Ravebera Pêş Sere

Sere her weke di navê wê xuya ye serokê amraz e ya ku bi wateyeke din amraza sereke ye di hevokê de. Çi peyv û amrazên din ên di hevokê de ne hemû ji bo xizmeta sereyê di hevokê de hene. Ango hemû amrazên di hevokê de hene erka wan diyarkirina sereyê ye, her di çarçoveya vê mijarê de nivîskaran û lêkolanan di derbarê sereyê nêrin û peyvên xwe anîne zimên û dibêjin, (sere peyveke serbixwe ye û koka firêzê ye yan jî firêz bixwe ye), (Tara Qadir Muhsîn, 1965; 135). Ango di çarçoveya vê pênasîyê de sere bixwe firêz e, anga curê firêzê sereyê diyar dike ku çi curek ji sere ye û navê vê sereyê çi ye û kîjan curên firêzê ye. Lewma gelek nivîskar û lêkolanan li ser vê mijarê peyivîne û erk û rola sereyê derxistine. Her di çarçoveya vê mijarê de lêkolerekî din ê zimannasîyê dibêje, (sere curê firêz diyar dike bi xwîneran re dide nasîn), (Êrnist Mekar, 1978; 55). Ango eger em bixwazin li pey firêzê bigerin, gerek sere diyar bikin încê ji me re xuya dibe ku kîjan curê sere ye, gel firêza nava ye, yan firêza hevalkarî ye, yan firêza hawelnavî ye yan jî firêza radeyî ye. Ango hemû curên firêzan bi sedema sereyê xuya dibin ku kîjan firêz e. Her wiha sere di hevokê de bi awayekî berbiçav ligel ew amrazên ku pêre tên ji hev re girêdar in û ligel peyketinên xwe di hevokê de li hev tên, bi şewazekê zanistî ya ziman û rêziman. Di jêr de em behsa van raveberan dikin ku dikevin berê sereyê dibin ravebera sere di hevokê de.

3.4.1.Morfema Deravêtinê-Morfema Derhawîştin

Ev morfem pêk tê ji çend peyvekê ku weke morfema deravêtinê tê nasîn. ev peyv jimorfema (her) û morfema (tenê) pêk tê, helbet çendîn peyvên din jî hene ku hemwateya van peyvan in weke (bes) ê. Di çarçoveya vê mijarê de ew peyvên ku erka ravebera werdigirin, di hinek deman de erka ravebera pêş sereyê werdigirin, lê di heman demê de dikarin erka ravebera pêş sereyê jî werbigirin, nivîskar û lêkolanan li ser vê rewşê nêrin û peyvên xwe tînin zimên û dibêjin: (morfema deravêtinê erka cudakirinê dibîne di komekê de), (Aso Abdulrehman Kerîm, 2008; 19). Ango ew morfem di hevokê de diyar dike ku wî karî kî bike û kî neke, yan jî kî ji ezmûnê serket û kî binket. Ango di hevokê de erka cudakirinê û diyarkirinê werdigire, ji bo vê

yekê di mînakên jêrîn de em vê mijarê şîkar û zelal dikin ku çawa morfema deravêtinê erka ravebera werdigire di zarê Soranî de.

Mînak

Her akam hat.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (akam)ê.
Her aştî serket.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (aştî)yê.
Her zana nehat.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (zana)yê.
Her arî hat.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (arî)yê.
Her jîr giry.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (jîr)ê.
Her hîwa çû.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (hîwa)yê.

Di van kom hevokan de ji me re xuya dibe ku (her) dibe ravebera pêş sere û erka ravebera werdigire û erka cudakirinê jî werdigire di nava komekê de, bo mînak dema ku dibêjin: (her aştî serket). Ango ji me re dibêje û dide xuyakirin ku di polê de tenê (aştî) serket, bi vî awayî jî di nava komek xwendekaran de cuda kiriye. Di jêr de em bi çend mînan tînin berbehs ji bo peyvên (tenê û bes)ê ku peyva (bes)ê heman wateya (tenê)yê dide di zarê Soranî de.

Mînak

Bes aram hat.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (aram)ê.
Bes arî serket.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (arî)yê.
Bes jîr çû.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (jîr)ê.
Bes hîwa nehat.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (hîwa)yê.
Bes aza neçû.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (aza)yê.
Bes kitêb binûse.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (kitêb)ê.
Bes gul ciwane.	Di vê hevokê de (bes) bûye Ravebera peyva (gul)ê.

Di van hevokan de ji me re xuya dibe ku morfema deravêtina (bes) ê erka ravebera werdigire û cuda kiriye di nava komekê de. Her wiha di jêrîn de çend mînan tînin berbehs ji bo peyva (tenê)yê ku çawa erka ravebera werdigire.

Mînak

Tenê bawikim hat.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (bawik)ê.
Tenê mamosta hat.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (mamosta)yê.
Tenê birat hat.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (bira)yê.
Tenê qelem bihêne.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Tenê kiç hatin.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.
Tenê kur hatin.	Di vê hevokê de (tenê) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Tenê binar serket.	Di vê hevokê de (her) bûye Ravebera peyva (binar)ê.

3.5.Morfema Nîşanê

Ev morfem yan jî nîşanê ye di hevok û axaftinê de, erka dabeşkirinê werdigire ku hevokeke yan naveke yan jî peyveke. Her wiha morfema nîşanê erka ravebera werdigire di hevokê de û rola ravebera dibîne di zarê Soranî de. Di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolera nêrin û peyvên xwe li ser morfema (nîşanê) anîne zimên û dibêjin, (morfema nîşaneyê erka ravebera werdigire û beşyarî dike di berfirehkirina firêza navî û firêza navî ya pêş sere de), (Seîd Sidiq, rûpel, 68, sal, 2008). Angomorfema nîşanê di nava hevokê de erka ravebera werdigire û her wiha rola berfirehkirina firêza navî dibîne di hevokê de. Her di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolera morfema nîşaneyê daşan dikin û gotnên xwe hene û dibêjin, (morfîmên nîşane (ew+e, ewane, eme, emane) ne), (Omêd Berzan Birzo, rûpel, 36, sal, 2010). Ango ev morfemên ku morfemên nîşanê û erka ravebera nav werdigirin. Her ji bo vê mijarê em çend mînakên di jêr de tînin berbehs û şîkarkirinê ku çawa morfema nîşanê erka ravebera werdigire.

3.5.1. Morfema Nîşanê ya (ewe)yê

Yek ji cureyên morfema nîşaneyê ye ku ji bo yekjimariyê tê bikaranîn, erka ravebera werdigire û dibe sedema berfirehkirina firêza nav di hevokê de, weke mînakên di jêrîn de ne.

Mînak

Ew kurem nasî.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Ew kure hat.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Ew kiçe hat.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.
Ew mindale girya.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (mindal)ê.
Ew dayike çû.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (dayik)ê.
Ew gule şika.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (gul)ê.
Ew jine royişt.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Ew piyawe neçû.	Di vê hevokê de (ew+e) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.

3.5.2. Morfema Nîşanê ya (emane)yê

Ev morfem jî yek ji wan morfemên nîşanê ye, ev morfem ji bo komê tê bikar anîn, angomorfema nîşanê ya komê ye, ev morfem erka ravebera werdigire û dibe sedema berfirehkirina firêza navî di hevokê de. Di jêr de em ê çend mînakên morfema nîşanê ya (emane)yê bînin berbehs û şîkarkirinê.

Mînak

Em kiçane basin.	Di vê hevokê de (em+ane_emane) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.
Em kurane çakin.	Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Em jinane nehatin.	Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (jin)ê.
Em gulane zîrekin.	Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (gul)ê.

Em piyawane azan. Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (piaw)ê.

Em şarane ciwanin. Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (şar)ê.

Em hespane xêran. Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.

Em mindalane hatin. Di vê hevokê de (emane) bûye Ravebera peyva (mindal)ê.

3.5.3. Morfema Nîşanê ya (eme)yê

Ev morfem jî yek ji wan morfemên nîşanê ye ku ji bo teka nêz tê bikaranîn, ev morfem di hevokê de erka ravebera werdigire di zarê Soranî de û dibe sedema berfirehkirina firêza navî. Her ji bo vê mijarê em ê di jêr de bi çend mînakên şîkar û şîrove bikin.

Mînak

Em gule ciwane. Di vê hevokê de (eme) bûye Ravebera peyva (gul)ê.

Em mindale hat. Di vê hevokê de (eme) bûye Ravebera peyva (mindal)ê.

Em şaxe berze. Di vê hevokê de (eme) bûye Ravebera peyva (şax)ê.

Em jine ciwane. Di vê hevokê de (eme) bûye Ravebera peyva (jin)ê.

Em kiçe base. Di vê hevokê de (eme) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.

3.5.4. Morfema Nîşanê ya (ewane)yê

Ev morfem jî yek ji wan morfemên nîşanê ye ku di hevokê de erka ravebera werdigire û dibe sedema berfirehkirina firêza navî di zarê Soranî de. Ji bo vê yekê em ê çend mînakên binivîsin di jêr de.

Mînak

Ew qelemane ciwanin. Di vê hevokê de (ewane) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.

Ew hespane hatin.	Di vê hevokê de (ewane) bûye Ravebera peyvya (hesp)ê.
Ew kiçane basin.	Di vê hevokê de (ewane) bûye Ravebera peyvya (kiç)ê.
Ew gulane ciwanin.	Di vê hevokê de (ewane) bûye Ravebera peyvya (gul)ê.
Ew kurane harin.	Di vê hevokê de (ewane) bûye Ravebera peyvya (kur)ê.

3.6.Hejmar-Jimare

Ev amraz yan jî ev peyv weke amrazekê di nav sentaksê de tê dîtin, her wiha hejmar beşdar dibe di berfirehkirina firêza navî de û hejmar erka ravebera werdigire. Ango hejmar dibe ravebera sereyê ya hevokê di zarê Soranî de. Her di vê derbarê de nivîskarên û lêkolanan li ser hejmarê nêrin û peyvên xwe tînin zimên û dibêjin;(yek ji taybetmendiyên hejmar ewe ku rasterast berê sereyê tê), (Eurehman Hacî Marif, 2000; 47). Ango hejmar berê sereyê pêwîstiya wê bi amraza danepal nîne, belkî hejmar rasterast dibe raveber di hevokê de. Her ji bo vê mijarê di çend mînakên de cureyên hejmaran dabeş û şîkar dikin.

3.6.1.Hejmara Bingehîn-Jimareî Bincî

Ev cure jî yek ji wan cureyên hejmaran e ku erka ravebera nav werdigire û dibe ravebera sereyê ya hevokê di zarê Soranî de û pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê ya danepal nîne ku berê navê tê. Ji bo vê mijarê jî em ê çend mînakên di jêr de binivîsin û şîkar bikin.

Mînak

Çar qutabî hatin.	Di vê hevokê de (çar) bûye Ravebera peyvya (qutabî)yê.
Yek mamosta hat.	Di vê hevokê de (yek) bûye Ravebera peyvya (mamosta)yê.

Du kiç hatin.	Di vê hevokê de (du) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.
Du qelem şikan.	Di vê hevokê de (du) bûye Ravebera peyva (qelem)ê.
Pênc piyaw hatin.	Di vê hevokê de (pênc) bûye Ravebera peyva (piaw)ê.
Dozdeh hespim kirî.	Di vê hevokê de (dozdeh) bûye Ravebera peyva (hesp)ê.
Panzdehgulyan heye.	Di vê hevokê de (pazdeh) bûye Ravebera peyva (gul)ê.
Sê kur nehatin.	Di vê hevokê de (sê) bûye Ravebera peyva (kur)ê.
Pêncî jin hatin.	Di vê hevokê de (pêncî) bûye Ravebera peyva (jin)ê.

Di van hevokên zarê Soranî de, weke berê jî me amaje pê da ku hejmara bingehîn di hevokê de dibe ravebera navî û pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê ya danepal nîne.

3.6.2. Hejmara Rêkxistinê

Ev cure jî yek ji wan cureyên hejmaran e ku erka ravebera nav werdigire, dibe sedema berfirehkirina firêza navî û dibe ravebera pêş sereyê ya hevokê di zarê Soranî de. Ev morfemaravebera hin caran pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê ya danepal heye, lê hin caran jî pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê danepal nîne. Ango li gorî cureyê hejmara ravebera yan jî curê hejmara sereyê dimîne anga nav kîjan cure. Ji bo vê yekê em di mînakên jêr de vê mijarê bi awayekî zanistî tînin berbeşê.

Mînak

Nîw sêwim xward.	Di vê hevokê de (nîw) bûye Ravebera peyva (sêw)ê.
Nîw nanim xward.	Di vê hevokê de (nîw) bûye Ravebera peyva (nan)ê.
Nîw henarî xward.	Di vê hevokê de (nîw-nîv) bûye Ravebera peyva (henar)ê.

Li gorî van hevokan ji me re xuya dibe ku ev cureyê hejmarê pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê ya danepal nîne, lê di mînakên din ên jêrîn de em ê çend mînakên binivîsin ku pêwîstiya wê bi morfema (î-y)ê ya danepal heye.

Mînak

Nîwey xaniyeke rûxa. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (xanî)ê.

Nîwey maleke firoşra. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (mal)ê.

Nîwey zewyeke roçû. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (zewî)ê.

Nîwey şar girya. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (şar)ê.

Nîwey daristan suta. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (daristan)ê.

Nîwey bax dizra. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (bax)ê.

Nîwey kiç bûn. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (kiç)ê.

Nîwey kur bûn. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (kur)ê.

Nîwey piyawan çûn. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (piyaw)ê.

Nîwey goşt bû. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (goşt)ê.

Nîwey aw birdî. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (aw)ê.

Nîwey seg xwardî. Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (seg)ê.

Nîwey şew were.	Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (şew)ê.
Nîwey sal hat.	Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (sal)ê.
Nîwey temen çû.	Di vê hevokê de (nîwey) bûye Ravebera peyva (temen)ê.

Her wiha di şiroveyên van hevokan de ji me re xuya dibe ku morfema (î-y)ê ya danepal e, piştî hejmara rêkxistinê tê.

3.6.3. Hejmara Parçeyî – Jimareî Kertî

Ev cure jî yek ji wan curên hejmaran e ku erka ravebera werdigire, dibe sedema berfirehkirina firêza navî û dibe ravebera pêş sereyê ya hevokê di zarê Soranî de. Hejmara parçeyî pajek ji tiştêkî nîşan dide, her di vê çarçoveyê de nivîskaran û lêkolanan bi vê awayî nêrin û hizirên xwe tînin zimên û dibêjin, (hemû hejmarên parçeyî ji du hemarên bingehîn pêk tên, ew du hejmar jî yek ji wan dibe sere), (Bebe Resul Nurî, rûpel, 2009; 75). Ango her du hejmar bi hev re tên û dibin hejmara parçeyî û ravebera sereyê û firêza navîberfireh dike di zarê Soranî de. Ev hejmarên parçeyî bi sedema morfema (î-y) ê ya danepalê ji pêş nav tê. Her di vê çarçoveyê de em çend mînakên tînin berbehs û şiroveyên zanistî ku çawa hejmara parçeyî erka ravebera werdigire.

Mînak

Çaryekî zewî newte.	Di vê hevokê de (çaryek) bûye Ravebera peyva (zewî)ê.
Sêyekî zewî awe.	Di vê hevokê de (sêyek) bûye Ravebera peyva (zewî)yê.
Pêncyekî zewî xuruşa.	Di vê hevokê de (pêncyek) bûye Ravebera peyva (zewî)yê.
Şeşyekî goştî xward.	Di vê hevokê de (şeşyek) bûye Ravebera peyva (goşt)ê.

3.7.Morfema Pirsyariyê

Ev morfem jî yek ji wan morfeman e ku dikare erka ravebera ya pêş sereyê werbigire û di berfirehkirina firêza navî rol bibîne. Her ji bo vê mijarê nivîskaran û lêkolanan nêrin û hizirên xwe anîne zimên û dibêjin, (Morfema Pirsyariyê dikare di berfirehkirina girêya navî rol dibîne û dibe ravebera pêş sereyê ya firêza navî), (Aso Ebdulrehman Kerîm, 2008; 21). Ango Morfema Pirsyariyê erka ravebera werdigire û erka berfirehkirina firêza navî jî werdigire û hevokê berfireh dike. Her ji bo vê mijarê nivîskar û lêkolên hizir û peyvên xwe bi vî awayî tînin zimên û dibêjin, (Morfema Pirsyariyê pêk tê ji peyvên (kam-kîjan, çend) ku erka ravebera werdigire), (Şêzad Se'îd Sidîq, 2008; 68). Ango Morfema Pirsyariyê ku erka ravebera werdigire û dike ravebera pêş sereyê û firêza navî berfireh dike di jêr de em şîrove dikin.

